

BERBANG

1/88

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê * Sal: 7 Hejmar 2/88



BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê
Li Swêdê
Organ för Kurdiska Riksförbundet

Berpirsiyar
K. Îzol
Serekredaktor

R. Zîlan
Redaksiyon

M. Bekir, C. Hayderî, J. Kurdo, R. Simo
Karê teknîkî
Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

Ansvarigutgivare
K. Izol

Chefredaktör
R. Zilan

Redaktion
M. Bekir, C. Hayderî, J. Kurdo, R. Simo
Sättning och layout
Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

Adress
Box 45205
S-104 30 Stockholm

Telefon
08/68 60 60

Postgiro
64 38 80-8

Aboneti/Prenumeration
Kes/Enskilda: 100 Skr./sal-år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr./sal-år

Îlan/Annonc
Rûpela paşîn/Baksida: 2000 Skr.
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr.

Redaksiyon ne berpirsiyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tîn şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên veşandin.

ISSN-0281-5699

Xwendevanên hêja,

Em sala we ya nû ji dil û can pîroz dikin û hêvî dikin ku sala 1988-an ji bo gelê me û ji bo xebata Federasyonê bibe sala pêşkewtin û serfiraziyê. Wek me di hejmara 6-em ya Berbangê de ji behs kiribû, êdî kovara me bi teknîkekî nû derdikeve. Ji ber vê yekê, di hejmarên 6 û 7-em de ji aliyê teknik û rastnivîsinê de gelek kêmasî û şaşiyên çapê hebûn. Em hem ji xwendevanên xwe hem jî ji xwediyên hin nivîsan dawayê lêborînê dikin û hêvî dikin ku ji vir û şûnda kêmasî û şaşiyên weha çênebin. Ji kongra 8-em ya Federasyonê re çend hefte maye. Komîta Kargêr, Komîta Giştî û Redaksiyona Berbangê kar û barên salekî wê pêşkeşî kongrê bikin. Herweha em hêvî dikin ku hemû endamên van organên Federasyonê di derbarey xebata borî û dahatû de ditin û pêşniyarên xwe ji bo Berbangê jî bişnin. Ji ber ku xebata Federasyonê hemû kurdên li Swêdê ji nêzik ve alaquadar dike, daxwaza me ji wan ew e ku, ew jî rexne û pêşniyarên xwe li ser rewş û xebata federasyonê bişnin ji bo Berbangê da ku em hemû bi hev re bikaribin Federasyonê hîn bi hêztir, xebateke hîn xurtir û çaktir pêk binin. Federasyonê di meha Kanûn ya 1987-an de du xebatên giring li dar xist. Ji van yek, damezrandina Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê bû ku bi Kongreki giştî di 6-ê meha Kanûnê de pêk hat. Di vê kongrê de nûnerên komelên endam ya Federasyonê beşdar bûn û yekîtiya ciwanan pêk anîn. Xebata duduyan, li dar xistina Musabaqa Folklorê Kurdî bû ku di 20-ê meha Kanûnê de li bajarê Stockholmê çêbû. Federasyonê ji bo vê xebatê nêzîkî 4 mehan hazirî kiribû. 7 komên folklorê ji 3 perçên Kurdistanê û nêzîkî 1300 mêvan di vî şahiyê de beşdar bûn. Ev xebata wek babet û wek naverok ji gelek aliyan ve alaqa hemû kurdên li Swêdê kişand. Ji ber vê yekê ev hejmara Berbangê bi giranî behsa van herdu xebatan dike. Bi hêviyên rojên baş û xweşiyê, heta hejmareke din hûn biminin di xweşiyê de.

Keya Îzol

Agehdari

Federasyon kongra xwe ya 8-em di rojên 13 û 14-yê sibata 1988-an de li dar dixê. Em hêvidarin ku komelên endamê Federasyonê bi riya nûnerên xwe rexne û pêşniyarên xwe ji niha de amedê bikin da ku kongreke bi hêz pêk bê. Herweha em hêvidarin ku kurdên li Swêdê û endamên komelên ku ne nûner in ji di kongrê de beşdar bin.

Cih û dema kongrê:

Medborgarhuset, Stora salen
T-Bana Medborgarplatsen -Stockholm
13 û 14 Sibat 1988
saet: 10.00 - 19.00

Sal: 7 Hejmar: 1/88 (46) 25.1.1988

Berga pêşîn: Musabaqa Folklorê

Berga Paşîn: Qazî Mihemed

Yekîtiyeke hêzên kurdî divê

Mihemed Bekir

Berî çend salan, swêdiyên ku mirov ji wan ra, behsa doza miletê kurd û têkoşîna wî dikir, digotin; "Doza we dozeke rast û adil e, em bi dilê xwe bi we ra ne."

Piştî ku du Kurd hatin kuştin (li Uppsala û Stockholmê) her wan swêdîyan digotin; "Ev karê ha karekî nebaş e. Divê Kurd xwe ji van metodan bi dûrxin. Em nizanin te'sîra kuştina mirova li welatên we çawa dibe, lê li Ewropa û nemaze li Swêd, karên waha dê bê şik zirareke mezin bigihînin doza we û gelek kes dê ji we bi dûrkevin."

Piştî kuştina serekwezîrê Swêd, Olof Palme, polisê swêdî, rasterast dixebitî ku kuştina Palme têxe stûyê hin Kurdan. Bi alîkarî û piştgîriya massmêdiya "rojname, radyo, têlêvisyon..." çend mehan bi şev û roj, polis her hewil dida ku miletê swêdî jî baweriyê bi wê yekê bîne.

Kurd bi awakî şaş û nedurist dihatin nîşandan. Gelek dostên Kurdan şaş diman. Nedizaniyê gelo dê çi bikin! Ji kê bawer bikin: Ji massmêdiya û polisê swêdî, an jî, ji Kurdan!

Lê ya hîn xerabtir, em Kurd bi xwe jî ne yek bûn.

Bi vî awayî, ne tenê miletê kurd di çavên Swêdîyan da reş bû, belku em jî, em Kurdên ku li Swêd dijîn, em ketine deravekî (dêraçekî) ecêb xerab. Gotinên radyo, TV, rojanaman û polis wek dilopan saet bi saet bi ser dilê me da dihatin, birîna wî her kûrtir û kûrtir dikirin, wek zinarekî mezin li ser laşê me her tûjtir û girantir dibû. Ne zaroyên me di dibistanan da, ne karkerên me di karxanan da, ne keç û jinên me, ne rewşenbîrên me, dikarî bûn xwe ji ber vê pêla bêbext vegirin.

Derd û kulên me Kurdan têra me ne dikirin, hîn ev bêbextiya giran jî bi ser me da hat. Şerê çar dewletên ku Kurdistan parve kirine ne bes bû, em bûn armanca tîrên gelek Swêdîyan jî.

Lê berê jî hatiye gotin: "Mirov dikare hinekan demekê bixapîne, lê nikare wan herdem bixapîne!". Polisê swêdî jî nikarî bû miletê swêdî herdem bixapîne. Hin camêr û rewşenbîrên swêdî û biyanî li hember pîlanên polis rawestî û pûçbûna wan dane xuya kirin. Ew zinarê giran û tûj ji ser piştî me hinekî rabû. Xwendevanên hêja! Eger em penaberên kurd ên li Swêd yekdest bûna, an jî bi kêmanî hevkarîyeke baş di nav me da hebûya:

-Gelo emê di pîrsa kuştina Palmê da, ewqas bihatana êşandin?

-Gelo emê waha destgirêdayî, li hember wê êrişê bêbext û rikgîr bimana?

-Gelo me yê rê bida wan swêdiyên ku di dilê wan da, pîlaneke holê hebû bi wî awayê jehirdar me rûreş bikin?

Her yek ji me bersiva van pîrsan baş dizane!

Lê tiştê ku bû, bû û tiştê ku çû, çû. Ez hêvîdar im ku, ji me penaberên kurd li Swêd ra, ew yeka han bibe derseke hêja. Dûrketina me ji hev, perçebûna hêzên me, ne tenê li welêt, belku li derî welêt jî, dê me bexîne bin lingan.

Hejmara Kurdan li Ewropa Rojava, îro nîzîka nîv milyonî ye. Birekî mezin ji wan, penaberên siyasî ne. Di nav wan da, welatparêz û rewşenbîrên xwedî zanî û tecrîbe gelek in. Ji hêlekê da, ev bextreşîya miletê me ye. Lê ji hêla din da, ev kesên jîr dikarin xebateke gelekî giring, li derveyî welêt bikin: Têkoşîna miletê kurd û doza wî ya adil bi awakî rast û durust bi miletên ewropayî bidin nas kirin, pîlanên dagîrkerên Kurdistanê yê riçperest ronaktir bikin û dostên Kurdan li Ewropa bêtir bikin.

Lê dijminên miletê me, baş bîra vê yeka ha dibin û dê her bixebitin ku cih li penaberên kurd, li Ewropa jî teng bikin û bi her awayî wan dorbirrî bihêlin.

Lewra divê ji bîra me neçe ku ew dijminên ha, pîlanine din, ji ya kuştina Palmê hê mezintir jî, ji me ra, pêk binin û bi her awayî hewil bidin ku danûstandina penaberên kurd û miletên Ewropayî bi carekê dijwar bikin.

Îro rewşa me li swêd jî berê baştir e. Îro em ji berî salekê, an çend salan niziktirî hev in. Ev mîzgîneke xêrê ye. Ev hêviya her kurdekî geştir dike. Ez bawerim ku îro gelek camêr, di kûraniya dilê xwe da, van pîrsan jî ji xwe dikin:

Çima me ev gava hêja berî demeke dirêj neavêt!!!

Çima me ewqas sal, diranên xwe di hevûdu da qîç dikirin? Çavên xwe di hevûdu da beloq dikirin, rûyê xwe di hevûdu da tehil dikir?

Çima me welê dikir? Karê me an jî karê miletê me ji wê yekê çi bû?

Belê di wan salên borî yê dijwar da, her Kurdekî li gor zanî û îmkanên xwe xebat jî bo miletê xwe dikir. Bi kêmanî her kurdekî jî çend swêdîyan ra, li karê xwe, li dibistana xwe, li mala xwe... behsa miletê xwe dikir.

Lê ew xebata xebateke gelekî kêmbû. Perçebûna me wa kiri bû, ku bêtirî em miletê swêdî bi doza miletê xwe bidin naskirin, em bi şerê hevûdu da, mijûl dibûn.

Xwendevanê hêja! Divê em doza miletê xwe û têkoşîna wî bikin pîrseke giring ku rewşenbîrên swêdî, siyasîyên swêdî, karkerên swêdî, xwendevanên swêdî û hwd. rastiya wê dozê baş nas bikin, bi dilgermî bendewarî wê bibin û piştgîriya wê bikin.

Heye ku yek vê pîrsê jî bike: Tirkîyê, Îraq û Îranê çarşiyên xwe ji sermiyanê swêdî ra vekirine, itîfaqên aborî bi milyardan digel Swêd pêk anîne, em Kurdên reben û belengaz, em çi dikarin bidin Swêdîyan? Em çi bikin jî bê fêde ye!

Ez bi wê yekê ne bawer im. Ew bi xebata miletê kurd û tevgera kurdî li welêt û li derî welêt ve girêdaye. Eger xebata me Kurdan rast û durust be, hingê miletê swêdî, wek ku piştgîriya şoreşa Vîyetnamê dikir, wek ku îro piştgîriya xebata reşên Afrîqa Başûr dike, ewê bi wî awayî jî, piştgîriya têkoşîna miletê me bike. Ma edaleta doza miletê me ji ya wan miletan kêmtir e? Ma zordariya ku li miletê me dibe ji ya ku li reşên Afrîqa Başûr dibe siviktir e?

Xwendevanê hêja! Penaberê kurd li Swêd! Divê em yekdest û yekdil bin! Tiştên ku me bigihînin hev, ji yê ku me ji hev bi dûr xin gelekî bêtir in. Em hemû jî bo dozeke pîroz, ji bo rizgarkirina welat û miletêkî dixebitin. Em li hember çar dewletên xwedî hêz û zanî têdikoşin. Eger dîtinên me di hin waran da, ne wek hev bin jî, divê em li wan dîtinên ku me digihînin hev bigerin, ne li yê ku me ji hev bi dûr dixin.

Gelo doza miletê me ne hêjayî fedakariya bi hin dîtinên taybetî ye? Hevalên hêja! Rewşa miletê me yê, ku di xwîna xwe da vedigevize, rê nade me ku em her perçebûyî û jihevketî bimînin! Bi vê belavbûn û perçebûna xwe, em birîna wî kûrtir dikin, roja azadiya wî dûrtir dikin. Divê em zanînbîn ku ev gunehkarîyeke mezin û giran e!

Xwendevanê hêja! Eger em di cihê xwe da rawestî, eger em pêşveçûna dîrokê nas nekin, emê wenda bibin. Ma tu miletan bi qasî Elman û Firensîyan şerê hevûdu kirin? Ma tu miletan bi qasî wan ji hevûdu kuştin. Disa jî, ji bo pêşketina miletên xwe, ew dest bi dest, bi hevûdu re dixebitin.

Çima em kurd nikaribin, bi dilsozî, bi hevûdu re bixebitin???

Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê hate damezrandin



Di roja 6.11.1987-an de, li bajarê Stokholmê kongra yekemîn ya Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê civiya.

Kongre ji 25 nunerên ciwanên kurd pêkhat û bi serfirazî derbashû. Nûnerên kongrê, ku ji bajarên têvel ya Swêdê hatibûn, herçar perçên Kurdistanê temsîl dikirin.

Li Swêdê gelek grûpên biyaniyan xwedî federasyon in û her federasyonêk jî xwedî rêxistineke ciwana ye. Rêxistinên ciwanan tenê bi karûbarê ciwanan û pirsên wan mijûl dibin. Ji bo xebata xwe ya li ser ciwanan jî, ew alîkariyeke mezin ji dewleta Swêdê digrin. (Qasî 400 hezar kronê Swêdê.)

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê herçend di sala 1981-an de hatibû saz kirin jî, heta niha rêxistineke ciwanan jî bo ciwanên kurd nikaribû damezrîne. Ev yeka bêgoman ji ber astengên ku di nava Federasyonê de hebûn.

Piştî ku Federasyonê di kongra xwe ya 6-emîn de (6,7-4-1986) avayiya xwe guherand, Komîta Kargêr di programa xwe ya xebatê de cih da avakirina Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê. Ji bo vî karê sekreterek di komîta kargêr de hate hilbijartin. Heval Battal, ku wek sekretêrê pirsê ciwanan hate hilbijartin, ji ciwanên kurd -endamên komelên Federasyonê- komîteke awerte pêkanî û dest bi karê amedekirina Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê kirin. Ev xebata, piştî kongra 7-emîn

(12,13,14-2-1987) ji aliyê heval Cemîl, sekretêrê nû yê pirsê ciwanan, hate domandin û di roja 6.11.1987-an de netîca xwe nişan da.

Bingeha Yekîtiya Ciwanan

Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê, rêxistineke ciwanên kurd e di nava Federasyonê de. Di her komeleke Federasyonê de seksiyonek jî bo ciwanan tê saz kirin, ku tenê bi pirsê ciwanan mijûl dibe û endamên komelê yê ku emrê wan binî 25 salî ne, dikarin di seksiyonê de bibin endam. Ew seksiyon bi hev re Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê pêktînin. Merkeza Yekîtiyê li bajarê Stokholmê ye. Ew di karûbarê xwe yê hundirî de serbestin, lê di karûbarê giştî de girêdayî Federasyonê ne.

Ev in armancên Yekîtiyê:

- 1- Ciwanên kurd li Swêdê temsîl dîke.
- 2- Li hember bikaranîna alkohol û narkotîkayê di nav ciwanên kurd de bi aktîvî kar dîke. Ciwanên kurd di derheqê netîca bikaranîna alkohol û narkotîka de bi reya civîn, film û weşanan aghdar dîke.
- 3- Ji bo beşdarbûna ciwanên kurd di warê musik, spor û xebatên kultûrî de, xebat dîke.
- 4- Ciwanên kurd di beşdarbûna tevgera aşîtiyê û dijînjadperestiyê de teşwîq dîke.
- 5- Ji bo ciwanên kurd ger û havîngehan amede dîke.
- 6- Ji bo xurtkirina şexsiyeta ciwanên kurd xebat dîke.
- 7- Ciwanên kurd teşwîqê xwendinê dîke û di vî warî de rênişanî wan dide.
- 8- Ji bo

bicîanina armancên xwe, bi rêxistinên din yê ciwanan re -çi biyani, çi swêdî- û bi merciyên resmî re hevkarîyê dîke. 9- Bîrûraya giştî li Swêdê di derheqê pîrsa kurdî û rewşa Kurdistanê de agêhdar dîke. 10-Dî herçar perçên Kurdistanê de piştgiriya tevgera gelê kurd ya netewî dîke.

Kongre bi serfirazî borî

Kongra Yekîtiya Ciwanan di saet 13.00-an de destpêkir. Sekreteriyata Federasyonê xêrhatina nûneran kir û piştî xwendina navên nûneran, kongre hate vekirin. Berî ku diwana kongrê bê hîlbijartin, bi axaftineke kurt, serokê Federasyonê heval Hanefî derbarê xebata ku hela roja kongrê hatiye kirin, kir. Dûre heval Feyrûz, heval Hewar û heval Zana bi hemû dengên nûneran ji bo diwanê hatin hîlbijartin. Diwanê sipasî kongrê kir û rê da heval Cemil, sekreterê Federasyonê yê pîrsê ciwanan ku axaftina Federasyonê bike. Piştî axaftina heval Cemil, ya dîrûdirêj û hêja, kongrê destûra Yekîtiyê, ku Federasyonê wek pêşniyar hazirkiribû, munaqasha kir û bi hin guhartinan destûr ji aliyê hemû nûneran de hate qebûl kirin.

Piştî munaqasha destûrê, nûnerên kongrê pêşniyarên xwe ji bo programa xebatê kirin. Di vê xalê de gelek pêşniyarên hêja hatin kirin. Di dawiya kongrê de Komîta Kargêr û Komîta Çavdêr yê Yekîtiyê hatin hîlbijartin û hemû nûneran bi çepikan serketina komîtan daxwaz kirin.

Kongra Yekîtiya Ciwanan, bi awakî gelekî rêkûpêk û demokratîk derbas bû. Di nava xebata kurdên li Swêdê, belkî ji di nava xebata kurdên li dervayê Kurdistanê de, yekemîncar e ku ciwanên kurd -yên ku emrê wan binî 25

salî ne- ji herçar perçên Kurdistanê tîn cem hev û xwe ji bo xêra neteweyê xwe rêxistinî dîkin. Li vir divê rastiyeke ji bê gotin; berî kongrê, hevalên amedekar bawer nedîkirin ku kongre bi vê dereceyê bi serfirazî derbas bibe. Lê ciwanên kurd bi sêwiya munaqashayên xwe û bi giraniya pêşniyarên xwe nişan dan ku wan xwe baş gîhandine û wê ji neslên borî û ji nesla nû pêşdetir gavan bavêjin. Ewê hêviya gelê kurdê bindest bi cîh binin.

Yek ji serfiraziyên kongrê jî ew bû ku di Komîta Kargêrî Yekîtiyê de sê keçên kurd cîh girtin. Heta niha di karûbarê kurdên li Swêdê yê komeleyetî de tucar di komîteki de sê keçan cîh negirtine. Ev ji nişanê me dide ku êdî jinên kurd jî di xebata civakî de cîhê xwe yê layiq digrin.

Bi mehekî berî kongra Yekîtiya Ciwanan, Federasyonê hemû rêxistinên siyasî yê Kurdistanê vexwandibû kongrê. Lê pir mixabin, tenê nûnerê Yekîtiya Sosyalîst ya Kurdistanê di kongrê de beşdar bû û mesaja rêxistainê xwe pêşkêşî kongrê kir. Herweha ji Komela Çanda Karkerên Kurdistanê -KOÇKAK, mesajek hat. Piştî Kongrê jî, Berey Yekgirtûy Demokrat nameyek şande Federasyonê û doza lêbordinê kirin, ku nûnerê wan ji ber nexweşiya xwe nikaribû di kongrê de beşdar bibe.

Gava nûnerên kongra Yekîtiya Ciwanan ji berpirsyarên Federasyonê sedemê beşdarnebûna rêxistinên Kurdistanê pîrsin, bersîveke ku berpirsyarên Federasyonê bidana, tunebû. Hêvî ev e ku hêviyên miletê me tenê neyên hiştin.


Axaftina sekreterê pîrsa ciwanan, heval Cemil

Hûn ser seran û ser çavan hatine kongra yekemîncar ya Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê. Em hêvî dikin ku kongra Yekîtiya Ciwanan bi rêkûpêki û bi serfirazî derbas be.

.....
Rewşa Kurdistanê, bindestbûna wê, çawa ku tesîrê li rewşa hemû tebeqeyên kategoriyên civata me dîke, usa jî tesîrê li rewşa ciwanên me dîke. Ev tesîr, di pêşveçûn û perwerdebûna ciwanan de bi awakî negatîv xwe nişan dide. Ciwanên Kurd jansê xwandina bi zimanê xwe, pêşdebirina kultur û folklorê xwe bi şeweyekî resmî tu car bi dest ne xistiye. Politîka asimilasyonê û ya kolonyalîstî pîşî li wan imkînan girtiye. Ciwanên Kurd mecbûr bûne ku zanî û xwandinê bi zimanekî biyani fêr bibin û xwe di warê rewşenbîrî da bigihînin. Ev jî bûye sebaba kêmasiyên mezîn çî di warê xwendin û nivîsandinê bi kurdî da, û çî jî di warê pêşdebirina kultur û edebî Kurdî de. Di warê siyasî, aborî û kulturî da gelê me pir tengast û nexweşiyên manevî û fîzîkî dîtine. Zordariya dijminê hov her gav di jiyana xwe de hîskirîye.

Lê ji aliyê din ve, gelê me tu çaran serî danenîye. Roj bi roj têkoşîna xwe geş kiriye, hêzên xwe saz kirine û rêberîya xwe hêjatiyê û hêzîyê kiriye. Kultur û civata xwe heta îro parastîye.

Di vê tekoşînê de gelê me rojên xweşî, şahîyê û rojên nexweşî û şînê dîtine. Ciwanên Kurd jî para xwe ji wan rojan, her wekî girtine. Berpirsiyariya xwe zanîne. Ji bona azadî, serxwebûn û rizgarkirina welatê xwe jî bindestîyê, berpirsiyariyên jî xwe mezîntir hilgirtine ser milên xwe û



ketine binê barekî gelekî giran ku di dinyayê da pir kêr hebûn wan hene, ku mecbûr bûn di salên jiyana xwe yê here kêrhatî û berkevtî de şerbîkin, dijwariya zindan û îşkence bibînin û di çar aliyên cîhanê da bibin penaber. Qerek bû ku wan jî ew salên xwe ên biberhem di xwandin, perwerdebûn û karûbarên rewşenbîrî da derbaz bikirana. Lê keç û lawê Kurd berpirsiyariyêke tarbî, bi hezaran problemên din jî hilgirtine ser milên xwe û hewî didin ku, wek hebûnên xwe, wek ciwanên dinê, zanîna xwe ferehtir bikin û azad bijî. Wan di salên xwe yê here lazîm de nikariye li ser axa xwe, di taxa xwe da bi zimanê xwe, di gel heval, hogir û xizmen xwe bîlze, bigere û bi aramî bijî. Dayîk û bavên wan di zarotiya wan da hatine girtin, surgun kirin an jî kustin. Pir çaran, pir malbatan jî ber wan sebebên diyarkirî, nikarîne erkên malbatî jî zarokên

xwe re bi cîh bînin. Zarok û ciwanan ew kêmasî di jiyana xwe da his kirine. Piraniya wan di rew, nexweşî da mezin bûne. Bi ser wê da jî ew bûne mihacir, bi hezaran km ji axa xwe, welatê xwe bi dûr ketine. Wek masiyekî ku ji nava ava xwe bê derxistin lê hatine. Penaberî li ser her însanî tesîreke nebaş dike, lê bê guman ew tesîr li ser zaro û ciwanan hê xurtir e. Mirovê gehîştî, dikare baştir bifîkire, baştir xwe biparêze û kêmtir biêşe. Lê zarok nikare xwe bi xwe biparêze, ew bi hewceyî parastinê ne. Bûyer rasterast tesîrê li ser ruhê wan dikin. Swêd, yek ji wan welatan e ku destê xwe dirêjî hinek insanên kurd kiriye û ew hewandine. Ciwanên mecbûrmayî, pir caran piştî gelek nexweşî û tehlikan gîhiştine Swêdê, an jî welatekî din. Hêviya wan jîyanek baştir e, lê mixabin, her wext ew daxwaza wan ûsa hêsan bi cîh nayê. Bi roja hatina wan re, li gor sewiya wan problemên têvel jî wek yên kultûrî, ciwakî, aborî... dest pê dikin.

Kultur, tevayîya berhema mirov, ya ku li gor îdealekê, armançekê pêk hatiyî ye. Dema ku însan tebtîetê careke din bi zanyarî pêk tîne, xwe jî peyda dike û her usa, kultura xwe jî pêk tîne. Çand bûyereke tarîxî ye û hemû qazancên faaliyetên însan ên hissî û fikrî tîne ziman. Her usa, hebûn, bûyereke ciwakî ye. Çand di gelek koçên tarîxî da, pir caran, ketiye bin tesîr û emrê çînen serdest. Çînen bindest nikarinê têra xwe istifade jê bikin.

Lê zîrekî û çalakî, karî û jîrbûn, tucarî ne dayînen zîkmakî yên ku tenê ji tebeqêke taybetî ra ne. Ji bo pêşdebirin û perwerdekirina wan, faaliyet û îmkanatên objektîv û reel pêwîst in.

Keç û lawên kurd nikarinê di nav civaka xwe da bimînin. Wan axa xwe terk kirine. Hatine welatekî din ku xwedî çandeke din e, çandeke dûrî çanda wan. Problem di qursên fêrbûna zimanê swêdî da dest pê dike. Kêmbûna wexta hînbûna swêdî, kêmbûna pirtûkên têvel, rêziman, ferheng û hwd. ji bo fêrbûna swêdî, bi zimanê kurdî, dibin sebaba derengketina fêrbûna zimanê swêdî.

Di hêlînen zarokan de, bi geleperî, îmkanên ku zaroyên kurd bi çanda kurdî bêne perwerdekirin kêmtir in. Balozxaneyên dagîrkerên Kurdistanê, nemaze ya Tirkîyê, her dixebitin, ku ew îmkanên hene jî bêne rakirin.

Pirsa xwendina bilintir hê dijwartir e. Keç û lawên Kurd mecbûr in ku di sêwiya zanîna keç û lawên Swêdî da bin. Problemên ciwanê kurd ji yên swêdî gelekî mezintir û dijwartir in. Yên Swêdî Li mala xwe û li her derê bi zimanê xwe dipeyive. Lê şagirdên kurd pir caran, ji ber ku zimanê Swêdî ne zimanê wan e zîkmakî ye, zehmetiyê dikişînin. Ew nikarin dersên xwe ên têvel, wek matematîk, fîzîk, kîmya, data û yên mayîn, bi başî, ji mamosteyên xwe têbigêhin.

Ji ber ku rewşa ciwanên kurd li welêt jî dijwar bû, gelek caran ew di dersên xwe da, ne biqasî ciwanên miletên din pêşketî ne. Lewra ew hewceyî alîkariyeke taybetî ne.

Pirsa alîkariya bi zimanê zîkmakî jî bi serê xwe yek ji pirsên giring e. Kêmbûna pirtûkên hêja ji bo hînbûna zimanê kurdî, karê mamostayan pir dijwar dike. Herçî xebatek ji bona hazirkirina materyalên nîvekar pêk hatibe jî, ew xebat hê di warekî şexsî da ye. Berhemên hêja hê nakevine destan.

Ji ber van sebebên jorîn, em dibînin ku pir kêmtir ciwanên me, dikarin di beşên hêja yên xwendegeha lîse (gymnasium) de bêne qebûl kirin û derbasî zanîngehê bin.

Lewra wezîfeya mamosteyê kurd wezîfeyêke giring e. Lê hin mamostayên kurd jî, di vî warî da, ji ber gelek sebebên, nikarin ew fonksiyonên ku divê pê rabin bi cîh

bînin. Lê ji bo alîkariya xwendevanên xwe di warê dersan da û ji bo rêberiya wan di warê hîlbijartina xwendina pêştir da, divê mamosteyên kurd her hewil bidin, ku zanîna xwe ferehtir û baştir bikin. Di aliyê din de, divê dê û bavên ciwanan jî hevkarê dibistanê û mamosteyê kurd bin. Eger em qebûl bikin ku ciwanên îro, xwediye civakî sibê ne, divê ew ciwan çî di warê teknîk û çî di warê ciwakî û fikrî da xwedî zanîna û qabiliyet bin, da ku bikarin têkoşîna miletê xwe pêşve bibin. An na nîşekî bêtêr û bê qabiliyet dikare miletê xwe têxe belayên mezin. Lewra berpirsiyariya civakê li hember ciwanan û ya ciwanan li hember civakê du aliyên pîrsekê ne.

Wek me berê jî gotibû, nîrên ciwanên me li derveyî welêt dijwar in. Di welatên sermayedar da, sîstema civakî bi awayekî waha hatiye saz kirin, ku hertim, mirovan ji bo amana serdestên wê civakê bi kar bîne.

Ciwanên ku nikarin, di nava şert û şirûtên wê da cihekî hêja bigirin, neçar dibin ku her karekî qebûl bikin. Elbet kar, kare. Tu karên ne baş tune ne. Lê muqayesa di navbera xwemaliyan û biyaniyan da aşkere dike ku neheqiyek berbiçaw heye. Gîhandin û perwerdekirinên ne wekhev bûne sebebên serneketina an jî wendabûna gelek ciwanan. Gerek e, ku ciwanên biyaniyan ji statûya kar û keda erzan bîna xilas kirin û cîhên ku ew jê ra kêrhatî ne bistînin.

Wextê vala jî warekî mujûlbunê î giring e. Lê mixabin gelek keç û lawên kurd wextê xwe yê zêde vala û bê fêde derbaz dikin. Kêmtir ji wan wê wextê giranbiha bi şeweyekî kêrhatî bi kar tînin.

Eger mirov bixwaze, dikare gelek tiştên hêja, li Swêdê di vî wextê vala de bike: Hînkirina ziman, edeb, dîrok, hunerên folklor yên têvel... Mujûlahiyên têvel di warê teknîk, sport... Xurtkirina danûstandinê di navbera ciwanan da... Xurtkirina bendewariya ciwanan bi pîrsên neteweyî û cîhanî de.

Di civata Swêdê da peywendiyên ku di navbera endamên malbetekê da, di navbera şexsan da (wek jin û mêr, mezin û piçûk, du hevalan û gruban da, bi kurtî ew peywendiyên ku insanên pêk tîne û hîmê cemaatê ne) ne wek peywendiyên cîmaeta me kurda ne. Ev ferqên mezin di navbera çanda kurdî û ya swêdî da, dikin ku gelek ciwanên me şaşmayî bimînin. Gelo ewê kîjanê qebûl bikin, an jî çiqasî ji her yekê qebûl bikin.?

Alkol, narkotîka û adetên ku dûrî civaka me ne jî, di nava ciwanên swêdî da tîne dîtin. Her çiqas aliyên kêrhatî ên peywendiyên civakî di civata Kurdî da pir xurt in û ew rola kontroleke nenivîsandî dibînin, dîsa jî mirov nikare bêje, ku ciwanên me dê xwe dûrî van adetên xirab bigirin. Ji ber ku civat organîzmeke jîndar e û em jî di nava wê da dijîn, pir tebîî ye ku emê jî bi hêlên wê yên positîv û negatîv tesîr bibin.

Problem pir û fireh in. Kêmasiyên me jî gelek in. Divê em çare û derman ji van problem û kêmasiyan ra bibînin. Lê li Swêdê gelek îmkanatên hêja jî hene. Eger em bi zanîna bixebitin emê bikarin, fêdeyêke hêja ji wan îmkanan bibînin.

Hinek ji berpirsiyariya hilgirtina vî barê ciwanan ne tenê dikeve ser milê tevgera kurdî, belku dikeve ser milê her kurdekî welatparêz, demokrat, şoreşger, pêşverû û sosyîst.

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, ji bo alîkariya ciwanan û helkirina problemên wan, Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê saz dike. Divê ev Yekîtiya ji bo çareserkirina pîrsên ku me bahs kir bê westan bixebite, da ku fonksiyonên xwe yên civakî bi cîh bîne.

Festîvala Folklorî Kurdî Stokholm 1987

-
- * Li Awrûpa yê cara pêşîn e musabaqa Folklorî Kurdî çêdibe
 - * Ji sê perçên Kurdistanê grûpên folklorê beşdarî musabeqê bûn.
 - * Bi listikên dorhêla Mutkiyê (qeza Bedlîsê) Koma Govend xelata yekemîn girt.
 - * Dengbêjên navdar Şivan û Gulîstanê jî bi deng û awaz û sitranên xwe şeva musabeqeyê geş kirin
 - * Nêzî 1300 kes di şeva musabeqeyê de beşdar bûn. Cara pêşîn e, ku li Stockholmê hewqas Kurd hatin ba hev û heft saetan bi hev re demeke bi kêf û şahî derbas kirin.
-



HÊVÎYÊN PÊŞEROJÊ

R. ZÎLAN

Berî çendekê Federasyonê li bajarê Stockholmê musabaqeke folklorî li dar xist. Bi qasî ku em dizanin, ev, bi giştî di çarçoveya derveyî Kurdistanê de û bi taybetî jî di çarçoveya Ewropayê de, yekemîn musabaqeke folklorî ya kurdî bû, ku hatibû li dar xistin. Bê guman ev pêşdehatina bi xwe bi me dide zanîn, ku ev yeka han ji bo me Kurdan qewmandin û bûyereke dîrokî ye.

Dîroka ber bi derveyî welêt koçkirina Kurdan, çî ya bi kotekî be û çî jî ya bi "dilkwazî" be, heye ku gelekî kevn be û bigihêje berî niha bi çend sedsaleyan. Bo nimûne, eger em nexwazin hinde dûrtir herin, em dikarin wê hema bibin heyama Şah 'Ebbasê Mezin. Lê bê guman, ji wê heyamê heya bi niha gelek Şah 'Ebbasê Mezin, hem jî yên ji wî mezintir û şaktir, hatin, li Kurdistanê fermandarî kirin û li serên Kurdan bûn bela. Tofanên xwe li wan xistin û ew bi kotekî kirin mişextî û hevparên jîna derbederiyê... Ji ber van hoy û sebeban e, ku îro li çaraliyên cihanê jî cema'etîne kurdî, ku bûne hevparên jîna derbederiyê, hene.

Heçî peydabûna Kurdan li Swêdê ye, heke em cara pêşîn hatina Şerîf Paşa(1895) û bi dû re jî hatina kesên wek Silêman, Sleman-Alexander Knutas(1929), nedin ber çavan, li derûdora dawîya salên 1960-î ye. Wê çaxê li Swêdê himek ji bo peydabûna cema'eteke(kolonîke) kurdî dihête danîn.

Berî her tiştî divê mirov wê rastiye bibêje, ku rewşa Kurdên li Swêdê ji rewşa Kurdên li welatên Ewropayê yên din gelekî cihêtir û baştir bû û baştir e jî. Bo nimûne, ji salên 1975-an û bi vir de, herçendî wê çaxê hejmara Kurdên li Swêdê nedigihîşte 2 000-î jî, zimanê kurdî wek zimanê zikmakî di dibistan û xwendegêhên Swêdê de dihête xwandin. Herçendî jî wê rojê heya îro dewletên kolonyalist yên ku Kurdistan di navbera xwe de parve kirine, di nav wan de bi taybetî Tirkiye, gelekî hewl dane da ku dewleta Swêdê vî mafî nede Kurdan, lê dîsan jî ev maf ji wê rojê heya îro jî heye û maye. Ev ne ji bo pesinvedana dewleta Swêdê yan jî siyaseta dewleta Swêdê ya li hember Kurdan e. Lê li bervajiyê wê, rastiyeke tehl e, ku divê mirov bibîne ka dewletên din yên ku ji sibehî ta êvarê bi navê demokrasî bang dikin û xwe dikin bervedêrên demokrasî û mafên mirovahiyê yên bingehîn, çilo serî ji destebirak, hevbend û dostê xwe Tirkiyê re diçeminin. Li gor xwesteka Tirkiyê, herweha li gor vegirker û kolonyalistên din jî, xwe li hember Kurdan tev didin. Herçendî li welatên wan bi dehhezaran Kurdên reben hene jî, lê ew wan, wek bo nimûne Tirkiyê, ji mafên wan yên tebi'î bêpar û bêbeş dikin...

Îro Swêd ji gelek aliyan ve ji Kurdan re bûye hêwirgehê. Bi taybetî piştî ku li Tirkiyê cuntuya faşîst ya generalên ser bi Amerîkayê dest danî ser hukim û herweha piştî ku şerê emperyalistiyê di navbera Îran û Iraqê de dest pê kir, ji ber rewşa li her sê perçeyên Kurdistanê peydabûyî, Kurd ji caran bêtir ji welatê xwe derketin û bûn mişextî. Beşeke giring ji van Kurdan berê xwe dan Swêdê û hatinê. Ji ber tercîhên kadroyên siyasî yên tevger û hêzên curbicur yên Kurdistanê, li Swêdê, hîmên baregehên siyasî yên van tevger û hêzan jî hatin danîn. Ji wê rojê û bi vir de êdî Swêd, wek cih û deverekî, roleke berbîçav dilîze. Swêd, ne bi tenê ji aliyê tevgera

siyasî ya kurdî de, lê belê di warê xebata çandî ya kurdî de jî xwedî roleke giring e. Wek diyar e, îro piraniya çapemeniyên kurdî yên mîna pirtûk, kovar, rojname û hwd li Swêdê dihêne weşandin...

Ne bes ev hinde, lê bi hizra min, Kurd li Swêdê jî xwediyê berdevkeke resmî ye baştir in. Ango hebûna Federasyonê, wek berdevkeke resmî, ku bikaribe li ba demûdezgehên cihêreng yên dewletê nînertiya Kurdan bike û bi ser navên wan biaxive, gelekî giring e. Bêguman hebûna wê giraniyeke bi rastî jî bi teqil dide daxwazên Kurdan. Çi demûdezgehên dewletê bin û çî jî hawîrên siyasî bin, nema dikarin navê Kurdan ji ber çavên xwe dîr bixin. Maf, daxwaz û xwestekên wan yên biheq bidin bin lîngan û pêpes bikin.

Helbet Federasyon divê ne bi tenê berdevkiya resmî ya Kurdan bike. Di gel erk û wezîfeyên wê yên siyasî, civakî û çandî barekî din î gelekî giran jî li ser milên wê ye. Ew jî vejandî û jîndarkirina ruhê kurdewariyê yê bi her reng û tûnî ye. Çi ye ruhê kurdewariyê?... Her tiştê ku bi kurdewariyê ve girêdayî ne û formek dane pêkhatina wê. Jê ya herî giringtir jî ew tişt in ,ku xizmeta pêşdebirin û geşepêdana civateke kurdî ya pêşverû dikin. Ev bi kurtebirî ziman, edebiyat, tore, çand û folklor û hwd in... Divê Federasyon vê erk û wezîfeya xwe çu caran neavêje paş guhên xwe û hertim pûteke mezin bidê. Ji vî aliyê de, lidarxistin û pêrabûna musabaqeya folklorî ya Federasyonê, tevî kêmasiyan jî, cihê serbilindiyê ye. Hêvî ew e, ku ew ji bo Kurdên Swêdê bibe destpêka adeteke dilgir û giranbiha, ji bo Kurdên li Ewropayê jî bibe xebat û çalakîyeke nimûnedar. Me hêvî heye, ku Federasyon çalakîyên holê bidomîne û herweha bêtir giranî û pûte bide kar û xebatên bi vî rengî yên ku her yekser han didin(teşwîq dikin) vejandî û pêşdebirina bi giştî çanda kurdî.

Heçî komên folklorê bûn, yên ku beşdarî musabaqeyê bibûn, çî yên ku xelat wergirtin û çî jî yên ku wernegirtin, bi her awayî jîrekî û jêhatibûna xwe raberî temaşekaran kirin. Ji wan her yekê hêleke Kurdistanê anî ser şanoyê(sehne). Govend û dilanên civata wê, ku wan gelek caran karakterên coxrafîk yên tebi'eta wê hêlê û herweha karakterên fizîkî û psikolojîk yên mirovên wan dianîn zimên, bi giştî hewes û hunermendiyên xwe ve berpêş dikir. Welê ku heke mirov ne govendgêr ba jî, mirov xwe wek govendgêrekî folklorhez xwe di nêv govendê de, dest di destên govendgêran de, didît.

Di musabaqeyan de, armanc û daxwaza dilê her kesî yan jî her komê, helbet xelatek wergirtin e. Lê tiştê ku di wê musabaqeyê de xwe dida xuya kirin, ev bû, ku her yek ji wan komên derece û xelat wernegirtî bi kêmanî bi qasî yên derece û xelat wergirtî şa û kêfxweş dibûn. Ji bo wan armanc ne bes wergirtina derece û xelat bû. Lê ya rastî, di van mercên mişextbûn û jîna derbederiyê de be jî, bi baştirîn awayî berpêşkirin û berpêşxistina folklorê kurdî ya rengîn û zengîn e. Herweha di gel van mercên em tê de jî, di xebata pêşdebirina folklorê kurdî de behredarbûn e...

Bi kurtebirî, ev musabaqeya lidarketî ji her aliya hêviyekê dide mirovî. Di serî de hêviya mizgîniyeke xêrê ji bo pêşeroja folklorê kurdî...

Di 20-ê Kanûna 1987-an de li Stokholmê Musabaqa Foklora Kurdî çêbû. Nêzi 1300 Kurd û Swêdî di vê şeva musabeqeyê de beşdar bûn.

Bi axaftineke (bi Kurdî û Swêdî) li ser navê Federasyonê, şevê dest pêkir.

Piştî ku juriya musabeqê çiyê xwe girt, teqdîmkarê şevê Omer Şexmûs piştî axaftineke kurt qaideyên musabeqeyê xwendin.

Grûpa pêşîn ji bajarê Bollnäs-ê Koma Zarokan bû. Listikên dorhêla Siwêrekê pêşkêş kirin û gelekî bala xelkê kişand. Piştî wan bi listikên xwe yê ji hêla Entabê (Gaziantep), Koma DILAN derket. Koma Dilan bi cil û berg, mîmik, liv û çivên xwe bala herkesî kişand. Salona şevê bi dengê def û zirnê û tew-tewa govendgêrên Koma Dilanê olan dida.

Koma Sulavê di gel enstrumentên xwe yê taybetî, wan jî listikên ji Kurdistana Iraqê pêşkêş kirin.

Bi şal û şapikên xwe yê rengîn, Koma Sîpanê jî listikên ji dorhêla



Hekariyê (Çolemêrg) raberî

Îranê Koma Henderan digel dengbêjê û enstrumentên xwe yê taybetî listikên xwe pêşkêş kirin.

Piştî Koma Sîpanê, ji Kurdistana

Axaftina Federasyonê di şevê de

Ev cara yekemîn e, ku li Swêdê, belkî jî li Evropayê, rêxistîneke kurdî şeveke weha amede dîke. Mebest jî vê şevê ne ev e, ku kîjan koma folklorê wê derca yekemîn bigre. Mebest jî amedekirina vê musabaqayê ev e, nasandina kultûra kurdî û teşwîqkirin jî bo pêşdebirina kultûra kurdî di nava kurdan de.

Yek ji nişana hebûna netewekî, kultûra wê neteweyê ye. Gava dijminê neteweyê kurd hebûna kurdan înkâr dikin, em bi kultûra xwe, ziman û edebiyata xwe, stran û dilanên xwe hebûna xwe nişan didin.

Neteweyê kurd, xwedî çandê dewlemend e. Ev çanda ye, ku koka xwe bi hezaran salan di kûraniya dîrokê de berdaye, hebûna miletê kurd li hember êrişên hov parastiyê û tucar nehîştîyê ku miletê kurd wînda bibe.

Îro li Kurdistanê şereki giran heye. Ev şera gihaye merhaleke weha ku divê, yan man, yan neman. Dijminê hov, jî bo ku karibe bi rehetî welatê me talan bike, dewlemendiyên welatê me bidize, dixwaze miletê me jî holê rake.

Lê ew baş dizanin, ku miletek bi kûştin, bi lêdan û zindan, bi sargunkirin, bi çêkê kîmyewî, bi bombebaran û bi şewat jî holê ranabe. Ji ber ku ew herçar dewletên dagirkerên Kurdistanê bi dehan salin ev rêça ceribandine, lê biser neketine. Çimkî mileteki 20 mîlyonî, bi kûştin jî holê ranabe. Lewra jî ew metodên din, metodên ku mileteki jî holê radikin, bikartînin.

Metoda wan ev e: kultûra me, stran û dilanên me, ziman û edebiyata me qedexe dikin. Ew baş dizanin ku eger kurd çanda xwe, ziman û edebiyata xwe, stran û dilanên xwe jûbir bikin, ewê jî holê rabin, wînda bibin. Di dîrokê de gelek miletên ku nikarinê kultûra xwe biparêzin, jî holê rabûne û wînda bûne.

Lewrayê, xwîşk û birayên xwêşewîst, ku dijminê kultûra kurdî, ziman û edebiyata kurdî, stran û dilanên kurdî qedexe kiriye. Vê yekê divê em baş bizanin û li gor vê

yekê jî divê em li kultûra xwe xwedî derkevin û wê pêşde bibin. Ji ber ku kultûr, di şerê azadiya mileteki bîndest de, çêkê herî başê!

Îro nêzîkî nîv mîlyon kurd jî ber zor û zilma dijmin jî Kurdistanê dîrketine û li van welatên Evropayê dijîn. Ev azadiya ku dijminê hov li Kurdistanê jî destê me girtiye, vaye em li welatên Evropayê dikarin bi serbestî bikar binin. Ji bo ku em karibin çanda xwe, ziman û edebiyata xwe pêşde bibin, saya hêzên demokrat û pêşverû yê civatên Evropayê, gelek îmkane me jî hene. Divê em van îmkaniyetan baş bikarbinin û kultûra xwe ya dewlemend, lê ya bîndest, rizgar bikin û pêşdetir bibin.

Di vê warî de barê herî giran li ser milên rewşenbîrên kurd û xebatkarên kultûra kurdî ne. Divê ew hewî bidin û di nav xwe de yekitiyan saz bikin û bi rêxistinî kultûra kurdî pêşde bibin, zarok û ciwanên kurd fêrî kultûra kurdî bikin, ji bona wan programên xas çêbikin. Di vê çarçovê de rola rewşenbîrên kurd û xebatkarên kultûra kurdî di şerê azadiya neteweyê kurd de mezin e.

Bêgoman, barê ku li ser milên kurdên li Evropayê, ne tenê pêşdebirina kultûra kurdî ye. Em hemû dizanin ku rewşa li Kurdistanê çiyê? Êrişên dijminê hov gihaye merhala gelqetliamê. Divê hemû hêzên welatparêz bi yek dengê û dest di dest de, li hember dijmin dengê xwe bilind bikin, piştigiriya tevgera rizgarixwaziya Kurdistanê kurt bikin û herweha birûraya giştî ya cihanê jî rewşa Kurdistanê aghdar bikin.

Di vî warî de her ferdeki kurd xwedî berpirsiyariyekê ye. Divê em tucar rewşa gelê xwe jî bîra xwe dernexînin. Ji bo rizgariya neteweyê xwe çî jî destê me bê, divê em bidin xizmeta miletê xwe. Di şertên îro de xizmeta herî mezin, xebata jî bo pêkanîna yekitiyêke demokratîk û netewî ye. Tenê yekîti me digihîne doz û armançê; Kurdistaneke yekbûyî, azad û demokratîk!

Piştî ku ev pênc grûpên Folklorê derketin û listikên xwe derpêşkirin, beşa yekemîn ya musabeqê temam bû.

Îcar dor, dora hozanê me yê bi nav û deng bû. Bû helhela xelkê, ji alikî de lîlandin ji alikî de çepik, holê Şivan derket sehnê. Şivan vê carê di gel grûpa xwe ya muzîkê derketibû ser sehnê

Şivan bi deng û tembûr û grûba xwe, temaşevanan jî bi çepikên xwe şev geş kirin.

Di dû behnvedanê re beşa diwemîn ya musabeqê dest pê kir. Di vê beşê de Koma Govendê, bi cil û bergên xwe yê rengîn, li gel du def û zirneyan listikên derhêla Bedlîsê û Bingolê pêşkêş kirin. Di nav listikên Koma Govend de, bi taybetî listika "Qertel" (Eylo) bala herkesî kişand.

Piştî grûpa Govendê, Koma jinan li gel dekoreke gundekî Kurdistanê, listikên dorhêla Diyarbekirê pêşkêş kirin. govendgêrên Koma Jinan 12 kes bûn, her weha 7-8 kesan jî di de-



korê de cih girtibûn. Koma jinan bi listika "Gur û Pez" destpêkir.

Sê grûp nikaribûn bihatana Musabeqeyê, ji ber vê yekê jî piştî ku

Koma Jinan jî listikên xwe pêşkêş kirin, beşa duwemîn musabeqeyê jî temam bû.

Piştî wê, juriya musabeqeyê jî bo

Federsayona Komelên Kurdistanê ev sê-çar mehîna ku haziriya vê musabeqê dikir. Di Berbangê de û her weha bi name û afîşan, da diyarkirin. Piştî wê 10 grûpên folklorê muracaatî Federasyonekî kirin ku ewê besdarî musabeqê bibin. Grûpên ku muracaatî Federasyonekî Kiribûn ev in: Koma Jinan, Sipan, Dilan, Şengal, Sulav, Govend, Henderan, Ararat, Koma zarokan, Koma Göteborgê. Piştî ku musabeqeya folklorê hate diyarkirin, Federasyonekî jî bo juriya musabeqeyê 7 kes helbijartin, ji

van 7 kesen 2 Swêdî û 5 jî Kurd bûn. Di juriyê de ev kes hebûn: Owe Ronström, Elvor Underdal, Mihemed, Ferhad, Bêrivan, Nedîm, M. Lewendî. Piştî civîna xwe ya yekemîn juriyê qai-deyên musabeqeyê û yê puandayîna di nav xwe de tesbît kirin û bi namçeyke resmî jî hemû grûpan re şandin. Puandayîna jî li gor hin nuxteyan li ser 100 puanî dihat dayîn. Li jêr em qai-deyên ku juriyê jî hemû grûban re şandibûn pêş kêş dikin.

Çerçewa pîvanên juriyê ji bo musabaqa Folklorê

1. Xweberî (15 p)

2. Pergala listikê li sehnê (15 p)

Di şertên sahne û zeman de karîna raberkirîna xusûsiyet û rûhiyeta listikê bi ahîyên wê yê karakterîstîk

3. Ahengdari (20 p)

Ahengdarî kesên listikê bi komê ve, ahengdariya listikê bi mûsikê ve, ahengdariya sergovendî û grûpê bi listikê geşkirinê ve,

4. Cil û Berg (15 p)

Koma ku li sernavê navçeyekê listika raberdike, divê ku cil û bergê wê navçeyê yê tebîî jî rapêçe.

5. Mîmik û hîskirin (15 p)

Listika ku govendgêrî bi laş û gewde û ruhê xwe di nav xwe de hîs dikin û bi wî awayî hildiperikin.

6. Zeman bikaranîn (20 p)

Xwe li gora zemanê ku hatiye tesbît kirinê (12 Deqqe) eyar kirin.

Piwandayîna li ser 100 puwanî li gora parvekirna 6 pîvanên jorîn



xelas kiribû û ji bo diyarkirina don-giya musabeqê hatin çiyê xwe. Kesên ku di şevê de beşdar bûn, çî guvendgêr, çî xelk hemûyan bi heyecaneke mezin meraqa neticê dikirin.

Serokê Juriyê Kak Mihemed dest bi diyarkirina neticê kir. Li gor vê; Grûpa Govendê bi 94 puwanan bû yekemîn, Koma Dilanê bi 91 puwanan bû duwemîn, Koma Jinan bi 86 puwanan bû sêyemîn.

Grûpa zarokan (Ji Bollnâs-ê) jî xelata juriyê girt.

Pûwanên grûbêndin ji ev in; Sîpan: 79 Puwan, Sulav: 70 Puwan, Henderan: 66 Puwan.

Piştî ku netîce hat îlankirin, kupa û xelatên grûpan bi destê Komîta Kargêr a Federasyona Komelên Kurdistanê, hate dayîn. Hozan Şivan jî yeko yeko hemû grûp pîroz kirin.

Ji derveyî kupayan xelatên ku grûpan girtin ev in: Xelata yekemîn 5000 Kron, Xelata Duwemîn 3000 Kron, Xelata Sêyemîn 1000 Kron, bû.

Piştî xelat û kupa dayinê, li gor qaîdeya musabaqeyê grûba GOVEND'ê careke din listikên xwe pêşkêş kirin û şeva musabaqeya folklorê jî xelas bû.

hesabkirina puwanan di nav xwe de civînek çêkirin. Di vê navê de Şivan û Gulistanê ligel du zarokên ji Kurdistanê Sûriyê sitran û kilam pêşkêş

kirin. Ji kesên ku hatibûn şevê, nêzî 300 kesî di orta salonê de bi hev re govend girtibûn.

Di vê navê de juriyê jî karê xwe

**Koma Zarokan
ya Komela Kurd Li Bollnasê
xelata juriyê girt**

Listikên dorhêla
Siwêrekê pêşkêş kirin û geleki bala
xelkê kişand.

Koma Govend
dereca yekemîn girt

Listikên dor
hêla Bedlîsê (Mutki) pêşkêşkirin;
Qertel- (Ji hêla Bingolê), Aşirtme,
Qerraş (Aşger), Motkanî, Tîrîngo,
Xezalê, Xerzanî, Sêpê, Hevkuşte
(Harkušte), Melavanî.



Koma Dîlan
dereca duwemîn girt

Listikên dorhêla
Entabê pêşkêş kirin; Mermerê,
Demonî, Şirwanî, Giranî, Leylim,
Hennê, Çepik.

Koma Komela Jinên
Demokratên Kurdistanê
Dereca sêemîn girt

Listikên dorhêla
Diyarbakirê pêşkêş kirin; Gur û pez,
Delîlo, Esmêr (Ha wer dîlo),
Govend, Çeçan, Çepik, Narê,




Koma Sipan

listikên dorhêla
Culemêrgê (Hekkariyê) pêşkêş kirin;
Pişteder, Zir Zeynê, Çuxo, Şere,
Baso, Bablekan, Lîzan, Mampir.



Koma Sûlav

Koma Sulavê di gel enstrumentên
xwe yê taybetî, wan jî listikên ji
Kurdîstana Îraqê pêşkêş kirin.



Koma Henderan

ji Kurdîstana Îranê digel
dengbêjekî û enstrumentên xwe yê
taybetî listikên xwe pêşkêş kirin.



"Hêsir û Baran"

Hêviyek e...

Zinarê Xamo

Çapxana Jîna Nû di îlona 1986'an de kitêbek Bavê Nazê ya çîroka, "Hêsir û baran" weşand. Kitêb 62 rûpel e û tê de 10 çîrok hene.

"Hêsir û Baran" ji alî hecmê xwe ve kitêbek ne pirr mezin e, wek me got, bes 62 rûpel e. Lê ji alî hêjayiya edebî ve ji hecmê xwe gelekî mizintir e. Bê guman "mezinbûn" tişteki îzafî ye, ez nikarim bibêjim çuqasî û li gor çi? Bi viya re jî, meriv dikare bibêje ku çîrokên B. Nazê li gel hîn "kêmasî" û qelsiyên bi rastî çîrok in, tevî zeîfiya zimên meriv wan bi kêf û bi heyecan dixwîne, dikare bixwîne. Û ev jî ji bo eserek edebî serkevînek muhîm e. Tişteki din ku bala meriv dikşîne, B. Nazê qet gotinên zêde nake, kin dibêje lê tişteki dibêje, em rast ema çewt...

Di çîrokên B. Nazê de meriv mewziyekê, temakê dibîne pirr ya jî hindik ji wan tamed estetik digre. Ji çîroka pêşî fahm dibe ku ew sîrf "ji bona nivisandinê" nehatine nivisandin, di wan de fikrek û armançek heye. Bi kurtayî, nivîskar her çîrokek xwe, li gor hostayî û bîr û baweriya xwe, ji gelşek gelê me re dike tercuman. Yanî çîrokên B. Nazê ji me re tişteki dibêjin, ev yek serkevîneke, dibê bête teqdir kirin. Viya aliyakî meseleyê ye, lê aliyê din jî B. Nazê di çîrokên xwe de "çi dibêje" û çawa dibêje? "Di vê nivîsarê de ezê hinekî li ser vî aliyê çîrokên B. Nazê bisekinim. Hêvî dikim ku wê B. Nazê bi van rexnên min neêşe...

Di çîroka "Hêsir û Baran" de (wer xuyaye ku nivîskar jî vê çîrokê pirr hez kiriye û lema jî navê wê li kitêba xwe kiriye) pîra Helîmê ji cîrana dibhîze ku lawê wê Mehemed bûye pêşmerge.

"Pîra Helîmê ji kure-pista cîrana naskir (Yanî fahm kir. Z. X.) ku kurê wê çûye nav pêşmergan. Pîrê destpêkê bawer nekir, çimkî kurê wê tu car derew lê nekiribû. Lê dema çûna wî dirêj kir, dilê wê şectî-yanî dilê wê xera bû. Z.X.- (rûpel 37)

Bi van gotinan em fahm -tê dighêjin- diken ku hetanî Mehemed nebûye Pêşmerge -yanî şoresger- tu carî li diya xwe derew nekiriye, yanî ne derewçîn bûye; derewçîniya wî piştî pêşmergetiyê dest pê dike. Mehemed, bi pêşmergetiyê, divê jiyana nuh de di dêlî ku qereker û şexsiyetek hîn baştir bigre, B. Nazê wî hîn piştir dike, dike derewçîn. Meriv dikare bibêje ku, B. Nazê xwestiye haya pîrê ji pêşmergetiya lawê wê tunebe û ji bo vê jî dibê Mehemed ji diya xwe re nebê. Lê B. Nazê girêdana van bûyeran bi hawakî herî ne xweş û herî rehet gotiye. Lema jî, hema Mehemed dike "derewçîn" û jê xelas dibe. Em dom bikin.

"Lê dema ku hevalekî ji hevalên wî hat ba wê -qest pîrê ye- û pere da dest bi vê gotinê re:

"-Mehemed li bajêr karekî baş dîtiye û ev pere ji te re şandin.

"Wê çaxê dilê pîrê kete çî, ku bi rastî kurê wê çûye bajêr ji bo kar. Heya sal zivirî, pîrê meh bi meh pere digirtin. (r.37)

Em dibînin ku yê derew li pîrê kiriye bes ne lawê wêye, her wisa hevalên wî nin jî, ew jî pîrê dixapînin. Gelo çima? Dibê meriv vê pîrê bike. "Gelo di rastiya welatê me de, di rastiya jiyânê de mumkûn e ku meriv bi "dizî" bibe pêşmerge û haya mala wî jê tunebe? Lê li gel viya jî em qebûl bikin ku Mehemed ji diya xwe re ne got, pêşmergetiya xwe jê "veşart". (Esas di rastiya Mehemed de wisa be jî, bi tevayî ne wisa ye. Lema jî dibê "îstîsnak" dewsa pîraniyê negre. Dema bigre, ji rismekî bêtir dibe "karîkatûreki" rastiye.) Lê piştî şehîdbûna wî, çima hevalên Mehemed hîn jî pîrê dixapînin, jê re nabêjin ku lawê te şehîd bûye?

Çawa ku pîrê pêşmergetiya kurê xwe ji cîrana bihîstibû, her wisa şehîdbûna wî jî ji wan dibhîze.

"Pîra pepûk her meh pera distine, lê nizane her heqê xwîna kurê wê ye." (r.37)

Bi van gotinan taswîrkirina alîkariya ku hevalên lawê pîrê bi pîrê re dikin raste -rast dujminatîya hevalên Mehemed e. (Yanî têkoşîna bi rêxistinîye). Meriv gelek baş dibîne ku B. Nazê li hember Mehemed ne objektîf e, jî wê bêtir terafgir û "dijmin" e. Ji ber vê yekê jî a dilê xwe bi cîranên pîrê dide gotin, "Pîra pepûk her meh pera distine, lê nizane ku heqê xwîna kurê wê ye." Ez bawer dikim ku tu "cîranekî dost" wisa nabêje û dibê nebêje... Ew alîkarî xwîdana eniya pêşmerga ye, ne "heqê xwîna Mihemed" e.

B. Nazê, hêzên kolonyalist yên ku welatê me bi darê zorê xistine bin nîrê xwe û di ser de Mehemed jî kuştine (A Xerab di çîrokê de ev hêz jî meçhûl in, em nîzanin kê Mehemed kuştîye.) dernaxe pêş, wan bi me nade naskirin, li hember wan bi me re kînekê, nefretêkê peyda nake. Di dilî viya ve îmajek wer dide ku, fena yên qatil hevalên wî bin. Bi kêmasî hedefa tîrên B. Nazê ne hêzên kolonyalist (qatilên Mehemde) in, ji wan bêtir hevalên Mehemde in. Mesaja ku em ji çîrokê digrin ev e. Û ji xwe di rêzên jêrin de ev armanç hîn baş xuya dibe.

"Gelekan ji kesên bajêr çîroka pîrê zanî bûn û pîrên wan di pîrê de dinasin dînbûn û xurafandin, (Qey dixwaze bibêje ku, -pîrên wan digotin qey pîrê dîn bûye û xurufîye- Z.X.) lê ne nîfşê yekem û ne yê dudan bi destê pîrê negirtin" (r.37)

Wek me berê jî gotibû, dilê B. Nazê ne bi pêşmerge re, lê bi pîrê re ye. Lê ew vê "dixwaziya" xwe derdixe Merhela piştigirîyê û jî wê jî wêdatir, tiştên li dijî hev jî me re dibêje. Ji ber ku carê em dizanin hevalên Mehemed her meh bi pîrê re alîkarî kirine. Lê B. Nazê vê yekê jî bîr dike û di dawiyê de dikare bi rehetî ji mera bibêje, "ne nîfşê yekem û ne yê dudan bi destê pîrê negirtin." Nuka

em wek xwendevanan ji kîjanê bawer bikin? Ya ji em dikarin wisa bibêjin: Heger "her mch" bi pirê re alîkarîkirin ku ne destgirtin be, gelo wê çaxê "destgirtin" çiyê?

Bi baweriya min di vir de tiştek pirr eşkere ye: B. Nazê li hember têkoşîna bi rêxistinî baweriyê û bê hêvitiyê bela dike. Bê guman ev karekî hêsan ye, her kes dikare bike. Ya muhîm ew e ku meriv di eserek edebî de baweriya bi têkoşînê û hêviya serketinê bide xwendevanan. Rewşa gelê Kurd û Merhela ku îro em tê de dijîn vê wezîfê dide ser milê her edîb û nivîskarekî Kurd. Pirr ya jî hindik, ew esera ku ji vê armancê re xizmetê neke, ew ne eserek baş e...

Di çîroka "Serpêhatiyên Kalo" de pêşmergeyek rojekê li çolê rasti kalekî tê, li Kalo disekine. Kalo ji pêşmerge dipirse, ka "li çi digere". Pêşmerge jî dibêje: "Em li 'çaşan' digerin. Kalo jî gotina wî bi pirs vedigerîne: "Li çaşan?"

Pêşmerge dibêje: "Erê Kalo li 'çaşan', ew jî xayinên millet in, tevî ku ew jî bi navê Kurdayetiyê ban dikin -Di vir de "ban dikin" ne di cî de ye.

Li ser vê bersîvê Kalo lê vedigerîne: "Ji kalê xwe re bêje kurê min, mero çilo we ji hev nas dike? -Yanî ji hev digerin-

-Bi navan... Heger ew ne ji me bin û şerê me bikin... Mana xwe 'çaş'in..."

Û Kalo jî dibêje, "Ma ew navê we dikin çî?"

Wek ku tê dîtin, di vir de jî B. Nazê ne hevalê "pêşmerge"ye, hevalê Kalo ye. Gelo çima? Em dizanin yê ku karibe ji me re jiyane baş ava bike pêşmerge ye, ne Kalo ye. Berî her tiştî pêşmerge xort e û îstîqbal ya wî ye. Le Kalo?, nîgekî -piyekî, lingekî- wî li vî alî dinyê ye û nigê din jî li wî alî dinyê ye. Û B. Nazê jî di dêlî ku yê zindî bike qehremanê çîroka xwe, wî bipolarêze", radibe yê mirî diparêze. Ji xwe pîrîniya qehremanê B. Nazê ya "Kal" in, ya "Pîr" in, ya "Serxweş" in, ya "derewçîn" û sextekar" in û ya jî "bê biryar, nezan û rebin" in. Qet di yekî de jî hêvî û jiyana tuneye. Qet yek jî meriv nikare ji xwe re bike numûne û jî dil jê hez bike...

Û ji vê jî muhîmtir, B. Nazê li hember gotina "çaş" an û vê muessesasê kevneperest dudil xuyaye. Em dizanin ku çasî di nav gelê me de sembola (sîfê) paşverûtiyê û îxanetê ye, loma jî "heqê" tu nivîskarekî Kurd (Qesta min nivîskarê realîstên Sosyalîst in) tuneye ku vê muessesesê şîrîn nîşan bide.

Dibe ku hinek bibêjin qesta B. Nazê ne "çaş" bi xwe ne, wî xwestiye ku li dijî şerê di nabêna hêzên welatperver derkeve. Heger nêta wî ew be jî meriv vê mesajê jê dernaxe û jî xwe jî diyalogên pêşmerge û kalo jî ev netice dernakeve. Ji ber ku kalo dibêje, "Ji kalê xwe re bêje kurê min mero çilo we ji hev nas dike?" Û pêşmerge jî dibêje, "Heger ew ne ji me bin û şerê me bikin..." Di vir de em nikarin ji gotinên kalo neticeyek wisa derxin, ku qesta wî şerê di nabêna hêzan de be. Ew raste-rast dibêje, "Mero çilo we (pêşmerge û ças) ji hev nas dike?"

Dilxwaziya B. Nazê ji kalo re ew ji rastiye pirr bi dîrxistiye û kiriyê kesekî "Terafgîr"! Loma jî heta jê hatiye pêşmerge ehmeq û nezan û kolo jî jîr û zane nîşan daye. Kalo jî pêşmerge re dibêje, "... te çîroka Yûnus Pêxmeber bihistîye?"

Pêşmerge jî dibêje, "Ya ez zanim Pêxemberek tenê heye û navê wî jî Mihemed e." Gelo çawa dibe ew merivê bîr dibe ku li dijî zulm û zorê û bindestiyê derkeve, dest bavêje çekê û ji bo vê armanca muqedes xwîna xwe birjîne, lê wê nizanibe ku beî "Mihemed" jî pêxember

hebûne? Wê bibêje, "Ya ez zanim Pêxemberek tenê heye û navê wî jî Mihemed e."!

Kalo qurretiya xwe didomîne:

"Lê kurê min dibêjin sê sed û şeş pêxemberên din hebûn, yek ji wan Nebî Yûnis bû... Ev Nebî Yûnis bû... Ev Nebî Yûnis heft salan xwedayê alemîn wî rût û tazi avête dingizê. Wîlo çermê wî tenik bûbû merov hestyê wî tê re didit. Nebî Yûnis gava çarên xwe vekir xortekî çarde çarde salî bi (ji) herdu çavan kor dît. Koro destê xwe dipeland, ku têkeve ser rîya rast. Nebî Yûnis destê xwe bi alî xwedê vekir û got: "Ma xwedao gunehê vî kesî çiyê, ku te ji bi çûkayî de wî (ew) kar kiriye? Û tê bi qedir û îzeta xwe kî, tê (tu yê) çavên wî sax bikî." Xwedê taela dua Nebî Yûnis bi cî anî. Xortê kor dît xwe nedît ji nişkave herdu çavên wî vebûn... Dema çavên wî li Nebî Yûnis ketin, koro yek nekir dudu rahişt zixurên serdevê dengizê û bi tepiza bi Nebiyê Xwedê ket. Laşê Nebî Yûnis wiha tenik û nazik bûbû, mîna tiliyê mêtayî, çaxa tepiz dihatiyê wîlo di laşê wî de diçû xwar... Nebiyê xwedê têtêkî li bernema xeynî bêje, "Xwedêo ti (Yanî tu) bi karê xwe zanî. Heger te nezanîba te ew kor nedikir."

Pêşmerge bi vê çîroka Nebî Yûnis jî qesta kalo fahm nake, lê ji ber ku kalo pirr î "jîr" e, tavilê bivê "Kêm aqiliya" pêşmerge hay dibe: "Ma gelo ti zanî heger xwedê Kurd bikirina tiştek ti dibê wê dinya xera nekirina?" Û Pêşmerge jî di dêlî ku bersîva kalo bide, qet dengê xwe nake û berê xwe dide çiyê.

Bi van gotinên mîstîk B. Nazê ji me re dibêje ku, "Kurd musteheqê bindestiyê û koletiyê ne û loma jî xwedê ew bindest hiştine..." û piştî ku ew bindestiyê me "emrê xwedê" ye, dibê em jî hustiyê xwe ji emrê wî re (ji qedera xwere) xwar bikin. Li hember vê felsefa îdealîst û dîtina mîstîk B. Nazê nahêle ku pêşmerge jî tiştekî bibêje. Em dev jî gotinê jî berdîn, pêşmerge di ser de van gotinên "kalo" wek mucizekê qebûl dike û qerde qerde berê xwe dide çiyê. Yanî meriv wisa fahm dike ku wê dev jî têkoşînê berde, ji ber ku têkoşînê edî tiştekî bêmaneye; tiştê xwedê nivîsandiye xera nabe..."

Çîroka "Navê min Xoşnavê". Qala jiyana telebetiya (xwendevaniya) zarokê bi çûk dike. Lê di rastiye de ew çîrok, ne çîroka jiyana Xoşnav bi tenê ye, ew, tirajediya hemû zarokên kurda ye. Bi xwendina carekê meriv jî çîrokê têr nabe, ji dil meriv dixwaze carek din û carek din bixwinê. Li gel vê hêjayiya çîrokê, hin tiştî henin ku bi xemsariyê derbas bûne, li ser wan bi hessasiyet nehatiye fikirin. Xoşnav dixwaze ku bi bavê xwe re here odê û li çîroka guhdariyê bike, lê nahêlin: "Û her cara xulamê axê bi guhên me digirt, em digewirandin." (r.12) "Tevî ku di odê de ez di nav şekalam de û nêzikî ciyê xulam rûdiniştim." (r.13)

Carê berî her tiştî, "qewirandina" zarokan ne şerte ku "xulamê axê" bike, her mezinê li odê dikare zarokan "biqewirîne." Yanî dixwazim bibêjim ku karekî wisa bes ne wezîfa "xulamê axê" ye. Lê esas ya jî vê jî muhîmtir, B. Nazê di oda axê de muessa xulamiyê, ciyekî xas-xusûsî- ji bo "xulam" çê dike. Xoşnav dibêje, "...ez di nav şekalan û nêzîkî ciyê xulam rûdiniştim." Îro di oda axê Kurd de çêkirina muessesasê wisa tiştekî kêfîye û ne rastiyeke oda axê Kurda ye. Ne rast e jî ber ku di sedsala 20'an de di odên axa de ciyekî "xulama" yê xas tuneye.

Wek me berê jî gotibû B. Nazê li ser hin tiştan baş nefikiriye û di ser guhê xwe re avêtiye. Û vê xemsariyê di çîroka "Rûreş" de hîn jî pêş de dibe.

"-Kurê min Beko, ti/tu- bûyî zilam û ev xelatên han jî

bona xwestina çîza Hecî Elî ji te re."

"Ma ti pîrsa navê wê nakî?"

Beko dibêje, "Ez nizanîm".

"Kurê min navê wê Sultanê ye.

"Beko kurê min diva bû, ti ji zûda çûba mala dergista xwe, lê ne xem e niha jî ti karî herî."

"Bi tena xwe?"

"Maşallah! Ma tu bi çûkî helbet bi tena xwe." (r.29.30)

Li gor salixdana nivîskar Beko hîn zaro ye, li nav gund bi zarokan re dilîze. Rojekê çaxa hevalên wî ban dîkinê, diya wî dibê: "Hûn ne yê n ku Beko bi were bilîze! Beko bûye zava (Esas Beko hîn nebûye zava, bi dergîstiyê).

Bavê Beko dibê "Helbet bi tenê" û bi rastî jî wî bi tenê dişîne mala xezûrê wî. Îcar bi vê jî nayê serî, di ser de dike qird û dişîne. Ka em bala xwe bidnê wê Beko çawa bişîne..

"Beko xweş naskir ku peyv li ser neçûnê bi bav re bê fêde ye, ji bo wiha (teví ku dinya payiz bû da ku xwe pê mezin bike) kurkê xwe li xwe kir, destê xwe di ser bêrikên xwe re bir, ji bo ku nasbike ku qutî û çeqmaq (Ew jî jê re nuh kirîne, ji bo ku bîna peyatiyê jê bê. Z.X.) di ciyê xwe dine." (r.30)

Beko li hespê suyar dibe dihere mala Sultanê, lê ji ya xerab re li wir, liba xezûrê û Sultanê ba bi ber dikve. Piştî vê "rûreşiyê" revî-revî vedigere malê. Û di dû re jî ji ber vê fediyê nikare bizewice. B. Nazê xwestiyê li hember van urf û adetên bê mane derkeve û heta derekê jî henekê xwe pê bike.

Yek, em bibêjin li gundekî Kurdistanê bav û lawekî wisa hebûn û têkliyên wan jî wek ku B. Nazê dibêje wisa bûn, me qebûl. Û cardin em ferz bikin ku bavê Beko ew bi tenê li hespê kir û şand mala dirgîstiya wî, (Li gel ku tişteki wisa li ba Kurda gelekî eybe) lê ji bo çî bavê bihêle ku Beko wê germê Kurk li xwe ke? Dudu, gelo li kîjan gundê Kurdistanê zarokên nuhatî kurka li xwe dîkin? Tiştê ku em dizanin li welatê me zarok, xort kurka li xwe nakin. Kurk, yê Erebaye û bêtir ew li xwe dîkin. Ji xwe di nav Kurdan de jî li alî Ruha (Urfa) yê tê li xwekirin û ew jî peyên (zilamên) navsale, peyên mezin li xwe dîkin. Lê Bavê Nazê li Beko kiriye.

Li ser kurkê Beko dikare bê gotin ku, "Ev ne tişteki muhîm e, ji qîmeta çîrokê tişteki kê nake... Raste, ne qusûrek pîr "Mezin" e, lê bi kêmasî di derheqê wan kesan û wê demê de rismekî rast nade me. A rast dibê kinc jî, axaftin jî û şexsiyet jî li gor demê hevdu bigrin. Em nikarin şevanekî bi strepamtor (bedil), bi qerawêt û bi şewqê lengerî (gotêr) bişînin ber pez. Loma jî, dibê kincên Beko kincên wisa be ku bi rastî ew karibe li xwe ke...

Piştî ku Beko vedigere malê fedî dike ku ji bavê xwe re bibêje welle li wir "ba bi ber min ket", di dêli viya, dibê: "Min Sultanê ne eciband." Bav dixeyide, dibêje; "Te çawa ne eciband?" Beko zû bi zû naxwaze rastiye bibêje. Lê bav û dê dide ser û Beko mecbûr dibe "bi şerim li ser rûreşiya xwe di peyive". Bav jî dibêje, "Tişt nabe, dema hûn hev bibînin muhremat di nav we de namîne" (r.34)

Beko dizewice.

"Piştî ku berbûk bela bûn, Hemo kurê xwe bir oda bûkê. Li devê derî di guhê wî de wişwişand. Bi zilam be û xwe neke ehmeq" derî li pey girt û veşerîya." (r.35) meriv çaxa van rêzên jorîn dixwîne meriv naxwaze ji çavê xwe bawer bike. Ka carê em bifikirin! li Kurdistanê bavekî Kurd berî zewaca lawê xwe dikeve oda bûkê û ji lawê xwe re birazavatiyê dike(!). Dibê B. Nazê hinekî li ser viya

bifikirîya. Mumkûne, ku li welatekî din, ya jî li welatê Eskîmoyan adetek wisa hebe, di kultura wan de ev tişteki normal be, lê li nav Kurdan tişteki wisa nabe, nikare bibe. Xezûr bi lawê xwe re nakeve oda bûkê û şîreta li lawê xwe nake. Yanî bav ji lawê xwe re nabe şoşban (birazava-, vî karî hevalekî wî yê zewicî dike.

Beko nikare bizewice û piştî çend deqîqa ji hindur derdikeve.

"Di hewşê de li bin guhê bavê xwe ket. Hemo ew sekinand û bi daf da pêşiya xwe. Li ber deriyê bûkê bi guhê kurê xwe girt û bi hêrs jê re got: "-Lawê kûçik ji bedêla hinerê xwe pêşî kiyê (yanî rê bede. Z.X.), ti ji ber wê direvî!?" (r.35)

Tiştê ku li ser çîrokên B. Nazê bibêjim ev in. Nuka jî dixwazim li ser zimanê wî çend numûna bidim.

Gotinên stranekê çuqasî xweş dibin bira bibin, çaxa dengbêj nizanibe baş bistrê wê kes li wê stranê guhdarî neke, heger carekê bike jî wê jê hez neke. Rewşa B. Nazê jî dişibe vê yekê. Hin çîrokên wî (Bîstek Bê rûmet, Navê Min Xoşnav e, Şaîroko) gelekî xweş in, di warê mewzû û avakirina çîrokê de xurt in, gelekî hêjane. Lê di warê ziman û izahê de pîr qels in. Çaxa meriv çîrokên B. Nazê dixwîne meriv timî lê dilukume, wek yekî berrivanî cara pêşî xwe dinav kevirên Qerejdaxê de bibîne. Gelek caran meriv mecbûr dimîne ku ji nuh ve de lê vegere... Li jêr ezê çend numûnan bidim.

"Piştî sê salan ji çûna xwe, Siyamend peyvên han di namakêde ji destekî xwend".(r.20)

"Em zarok, heger li gund êvaran li ser benderan me dilîst, li vir, li bajêr, li başûrê malan, li dora bexçan, her wekî li gund me dilîst. (r.23)

"Lê niha dema bavê wî li ser xwestinê jê re peyivî ku wê di demek nêzik bibe bi jin.."(r.29)

"Çimkî wê ne lawîq bê lîsk bi wan re." (r.29)

"Ez bi gotinên wî dihesiyam mîna kevira bi ser min diweşînin." (r.56)

"Û cara pêşî piştî dîtina wî ji deftera helbestvanekî nenas poşman bûbû."(r.50)

"Ma hewceye ti beqelqî ser vî tiştê vala." (r.34)

Bê guman çaxa meriv van rêzan dixwîne fena ku hinek qevdik derzî di guhê meriv re ke, ya jî bê kê m û zêdayî weke ku etarekî (çerçî) rişmilî bipeyive..

"Beko jî dixwest bi qalûnvexwîrî (Berî viya bi çend rêza em van gotinan dixwînin: "Da ku Beko zilamtiya xwe pêş dergîstiyê bike qutî û çeqmaq ji berîka xwe derxist, hem ji kêfa a hem jî ji fediya, bi destekî ricfî dest bi pêçana cixarekê kir." Lê dûre em dibînin ne cixarê, lê qelûnê dikşîne.) bi zilamtî jê re bide nasîn." (r.31)

Ez bawer dikim ku ji bona naskirina zimanê B. Nazê van numûnayên jorîn bes in û ne hewceye ku meriv li ser çewtiya wan zêde tişteki jî bibêje.

Piştî xwendina "Hêsir û Baran" meriv bi hêsayî dibîne ku nuxta B. Nazê ya herî zeif, qelsiya zimên e. Gelek caran bi meriv re întibayek wisa çê dibe ku, fena çîrokên "Hêsir û baran"ê bi Kurdî nehatibin nivîsandin, ji Erebî hatibin wergerandin. Heger wisabe jî, ne pîr xweş e, û qelse: dikari bû hîn baştir bihata wergerandin.

Li gel van kêmasî, çewtî û qelsiyên zimên, yê ku îro di warê çîroknivîsandinê de hêviyekê dide meriv cardin B. Nazê ye. Lê dibê ew, xwe ji "zimanê" meheli xelas bike û bi "devokek" wisa binivîsîne ku hemû (Ya jî pîrrianiya) gel karibe jê fahm bike û ha bike. Çimkî, gotina rast çaxa bi zimanekî xweş bê gotin jê tê hezkirin.. Û em hêvî dîkin ku B. Nazê wê di rojên pêş de gelek eserên xweştir bide me...

ههلبهست

" یاد "

عفان

گیانه و مره ، و دهست توند ههلسوو ،
 له سهر زامی قوولی سهر سینگم ،
 ههتا دلم له لهرزینی سامی سهختی -
 شهو نازارانت بکهوی . .

ههتا دلم پیش چاو لیک نان ،

شهگر بو ساتیکیش بوو بیئت بسرهوی

x x x

گیانه و مره . .

مهگهپیوه . .

مهگهپیوه . .

له تهکما به ،

لهگمل گرو سۆزی دهرورن له ناخما به . .

مهگهپیوه تا پیئت بلیم چیم لیئت شهویت

نهومک کاتییک له جیهکا شههید کرام

خۆشهویستیت لهگمل لاشما بنیژریت

کوردستان - قەندیل - ۱۹۸۱ / ۶ / ۱۹



بووه ، به لام له ئاستی ویست و توانای ئیجه نهبووه ، چونکه دهکرا زۆر باشترو فرهوان تر و دهولههمند تر بی . به لام وهک یهکهه ههنگاو جی دلخۆشی و شانازی .

پیشنیار بو قیستیقای

هونەری کوردی له سالی ۱۹۸۸

بهم بوتهیهوه ، چهند پیشنیارم همیه بو کۆمیتهی کارگیری داهاتوو ی فیدراسیۆن و کۆر و کۆمهله هونەری و فولکلۆریهکان ، هیوادارم که سوودی لی وەرگرن ، بو سالی داهاتوو ، یاخود باشتره بلیسن بو پیشبرکی داهاتوو ، بو گێرانی قیستیقای هونەری کوردی له سوید دا :

— پیشبرکی هونەری کوردی ، نهک تهنیا فولکلۆری کوردی ، واته : ههلبهکر و لاۆرانی (رهسهنترین نمونه پیشکش بکری) . .

— شانۆگهری (دهقی کوردی خۆمالی) . .

— پیشانگای جل و بهرگی نهتهوایهتی ، کهل و پهلی گوندی ، هونەری چینی و خواردههمنی کوردی .

— پیشانگای هونەری تهشکیلی وگرافیک وپهیکه تاشی .

— کۆر و سیمیناری بابهتی لهسهر (فولکلۆر ، هونەر به ههموو بهشهکانیهوه) .

بو شه مهههستمش پیویسته له ئیستاوه ، به گیانیکی ههست

به بهربرسیاری بهرامهر کولتووری گهلی کوردمان چهند ههنگاویک بنیسن :

— دامهزراندنی کۆمینهی پیوندی و هاوکاری له نیوان کۆمهله و تیپهکانی فولکلۆری کوردی به هاوکاری لهگه فیدراسیۆن .

— کۆکردنهوهی گۆرانی بیژو موسیقایه کوردهکان له کۆمهلهیه کی یهکگرتوو دا ، دوور له رهوشتی تاکه کهسی و خۆ سهپاندن ، له پیناو خزمهت و پیشخستنی ئاواز و موسیقای کوردی ومتربه کردنی

به موسیقای جیهانی . لهم بارهیهوه پیویسته گرینگی بدریتته

ئاوازی فولکلۆری رهسن و پاراستنی سیمایهتهوابهتی و ئاوازی میلی ، ههروهها شان بهشانی ئاوازی فولکلۆری ، پیویسته موسیقا

ژهن وهونهرمهاندانی شه بواره پیشکشهوتنی موسیقاوههلبهکرکی رۆژهلات و جیهان لهبهر چاو بگرن له دارشتن و دابهش کردنی

موسیقاوههلبهکرکی دا .

— هاوکاری له نیوان موسیقا زانان وموسیقا ژهن و شاعیرانمان بکری له دارشتنی گۆرانی و سرودی نهتهوایهتی (میلی) ، دور لهسه

دزینی ئاوازی بیگانه ، چونکه بهداخه وه زۆر له سروده نیشتمانیه کانتان تمنیا ووشهکانیان کوردین . . . راسته ههندی سرودی

جیهانی شورشگێر همیه ، که به یهک ئاواز دهگوتری ، به لام سروده کانی ئیجه بهداخهوه له رادههدهر لهسهر نۆت وئاوازی بیگانه

داربژراون .

هیوادارم خۆیتهرانی گۆقاری " بهربانگه " و کۆر و کۆمهلهکانی کولتووری و فولکلۆری وهونەری ، سوود لهو پیشنیاران بهکن بو

لیکولینهومو دارشتنی پروگرامیکی لمبار و ریالیست بو شه مبهسته پسرۆزه .

خۆپیشاندا نیکی سەر کهوتوو



فیدراسیۆنی کۆمهلهکانی کوردستان له سوید، له ماوهی سالی رابووردوو دا، بهشداری له راپهراندنی زۆر چالاکي کۆمه لایهتی و کولتووری پهناهنده و ئاوارهکانی بیگانه و کوردی کرد، وهك : فیستیفالی ناشتی، سیمیناری سی رۆژی له بارهی کورد له نیسکلستو- نا، جگهله راپهراندنی کاری رۆژانهی پهناهنده کورده کان، بـه نایبهتی یارمهتی دانی ئەوانه‌ی تازه دهگه‌نه سوید ، یاخود لسه رینگا به‌رهو سوید له هه‌ندی ولاتدا تووشی مه‌ترسی گه‌رانه‌وه‌ی عیراق وئیرانیان ده‌بن .

له تهك ئەو کارانه‌دا ، گێرانی کۆر و سیمینار له‌سه‌ر شه‌ده‌ب و زمان و رۆژنامه‌گه‌ری ٠٠٠ هتد . به‌کێک له‌و چالاکیه هه‌ره دیاره‌کانی فیدراسیۆن له ژبانی کولتووری کورد له سوید دا ، ئەو پیشه‌ریکـیه فۆلکلۆری یه‌ بوو که له ١٩٨٧/١٢/٢٠ له ستوکه‌هۆلم کـرا . ئامانجی ئەو خۆپیشاندا‌نه هونهری یه‌ ئەوه بوو ، بۆ دۆست و دوژمن ده‌ری بخا ، که گه‌لی کورد ، هه‌ر چهنده دووچاری چه‌سانه‌وه‌و سه‌رکووت کردن هاتوه‌و له لایه‌ن ده‌وله‌شه‌ داگیرکه‌ره‌کانه‌وه ، به‌لام سیمای ره‌سه‌نی هونهری فۆلکلۆری خۆی پاراستوه و گه‌ر هه‌ل و مه‌رجی سه‌ربه‌ست و ئازادی بۆ بلوێ ، بۆی هه‌یه به‌شداریکی چالاک ته‌سر و به‌ پیت و به‌ر تر پیشکه‌ش به‌ شارستانیه‌تی مرو‌قاپه‌تی بکـا . بۆ یه‌که‌م جاریش له سوید دا ، له رینگای ئەو خۆپیشاندا‌نه هونهری یه‌وه ، به‌ جو‌ریکی وا فره‌وان و رینگ و پینگ ، هه‌له‌په‌رکی کوردی ناوچه‌ جو‌ر به‌ جو‌ره‌کانی کوردستان پیشکه‌ش کـسو‌ردی دانیشه‌تووی سویدو بینه‌ری سویدی کرا . بۆ یه‌که‌م جار هه‌له‌په‌رکی هه‌کاری و که‌رکوک ، دیاربه‌که‌رو ورمی له ته‌ك چا‌و دلی بینه‌رانی کووشاد کرد ، به‌ پیچه‌وانه‌ی ویست و خواستی دوژمنانی کورد که به‌ هه‌موو جو‌ریک هه‌ولیه‌یان داوه‌و هه‌ول ده‌ده‌ن کورد لینگ دابسه‌رن و هه‌ستی نه‌ته‌وايه‌تی و گیانی یه‌کیته‌ی کورد دابمه‌رکینه‌ن .

بیگومان ئەو خۆپیشاندا‌نه هونهری یه‌ ، هه‌ر چهنده سه‌رکه‌وتوو



کوردان ، لۆلۆو میدی و کاشی و کاردۆخیان ، میرو میرنشینه کانی کوردستان ، حسنه وی و موکریان ، سۆزان و بابان ، بنسه مائهی ههرده لایو ناوادرانی لوپستان ، شاری ههولیرو دهشتی شاره زوورو روداو ههروه کانی مههابادی خوئین-ههوباسانه که مامۆستا حوزنی شهونخونی بۆ ده کیشان و برستی له ریگه یاندا ده پیشت ! ، یا « گهلاویژ » گوتهنی « لاپه ره کانی ژبانی ... بۆ خه رج کرد ، زه مانی جوانیی بۆ دانا ، عمری گران قیسه تی له پیتساویا برانده وه ، له ریگه یا چهوسایه وه ، رووتی کیشا ، برستی پیشت ، ده به ده هری و مل کرزیی شارانی گرتنه ئه مستۆ » (٢٤) . دیاره هه ره له به ره وهش بوو که پۆزی ٢٠ له یولوی سالی ١٩٤٧ له به غدا گیانی به دهسته وداو لاشه ی به خاکی ههولیری دیرین سیتدر (٢٥) دلسۆزان له قولایی دله وه گوئیان « حوزنی نه مردوت ، نامریت ، له گۆشه ی و لاتا شسویت ته رخانه ، ئه سه ره کانت چاوه ندازی چاوی دل وریاکانه » (٢٦) .


هه ره چنده وایه ده چیی سه رچاوه کانی نووسینه میژوو یی به کانی مامۆستا حوزنی هی ره سه نیان که م نه بن ، به لآم هه مان کات ئاشکرایه که نه و سه رچاوه به ژماره ژۆر نه بن . بێ گومان شه ره فنامه ی شه ره فخان ی بدلیسی په کیکه له سه رچاوه سه ره که به کانی زور به ی به ره مه میژوو یی به کانی ، تابه ت « ناو ریکی پاشه وه » (٢٢) . به کسار هتانی نه و جۆره سه رچاوه له لایه ن حسه ن حوزنی به وه سه رنجی باسیل نیکیتی پرا کیشا وه که ده لێ :

« حسه ن حوزنی نووسه ری کورد ... دواسالانی ژبانی بۆ لیکۆلینه وه ی میژوو ی کورد ته رخان کردو چه ند کیتیکی له واره به وه بلا و کرده وه که سه رچاوه یان ده ستووس و قسه ی سه رزاری پیتساویان و سه رچاوه ی عه ره یی و تورکی و فارسین » (٢٣) .
له به ره مه کانیدا حسه ن حوزنی باسی میژوو ی کۆن و سه ده ناو نجه ی به کانو قولانگی نوئی کوردی کرده وه . نه زادو په گه زو زبان و ئایینی

سه رچاوه کانی میژوو . به غدا . ١٩٨٧
١٦٦ - ١٧٤

٤٨ - A. M. Hamilton, Op. Cit., pp. 122—123. 237
٤٩ - ئه م وه ره ی له کۆفاری « الهلال » ی میسری به وه وه مرگرتوه وه به دوو جار بلا و کردۆته وه (بروانه : « گهلاویژ » ، ژماره ١ ، کانوونی دوومی ١٩٤٤ ، ل : ٥٤ - ٥٧ ، ژماره ٣ ، ماری ١٩٤٤ ، ل : ٢٣ - ٢٧) .
٥٠ - بروانه : « گهلاویژ » ، ژماره ١٠ ، ته شرینی به کهمی ١٩٤٤ ، ل : ٨١ ، ژماره ١ ، کانوونی دوومی ١٩٤٥ ، ل : ١٤٧ .
٥١ - چکه له هه ردوو زاراوی سه ره کبی کوردی عه ره یی و فارسی و توو کیشی ده زانی .
٥٢ - بۆ خۆی مامۆستا حسه ن حوزنی له نووسینه کانیدا چه ند جارێک ناوی « شه ره فنامه » و نه و جۆره سه رچاوه ی هتیا وه (به وینه بروانه : « ناو ریکی پاشه وه » ، به ندی دووم ، ل : ٢٧) .
٥٣ - B. Nikitine, Op. Cit. چاپی روسی ل ٢٧٠ .
٥٤ - « گهلاویژ » ، ژماره ١-٩ ، له یول - ته شرینی به کهمی ١٩٤٧ ، ل : ٦٨ .
٥٥ - خۆی به ره له وه فاتی داوای کردبوو له ههولیرو بنیۆری .
٥٦ - بروانه : « گهلاویژ » ، ژماره ١-٩ ، له یول - ته شرینی به کهمی ١٩٤٧ ، ل : ٧٠ . شایانی باسه مامۆستا شاکر فه تاحیش له نامتیکه به کبی ٣٠ لاپه رییدا به تابه تی باسی ژبنامه و به ره مه و چالاکی به کانی مامۆستا حسه ن حوزنیی کرده وه (بروانه : شاکر فه تاح ، داموای موکریانی ، سلیمانی ، ١٩٧٢) .

١ - به وینه بروانه ئه م ته سانه ی نه ندازیاری ئینگلیز هاملتن ده براره ی حسه ن حوزنی له کتیه که ی خۆیدا کرده وێ .
A. M. Hamilton, Road through Kurdistan. The Narrative of an Engineer in Iraq, London, 1937.
٢ - وه ک گۆرکی که ناژناوی نووسه ری سو فیه تی به ناویانگ ئه لیکیتی مه کسه ئیچ پیتسه که (١٨٦٨١ - ١٩٢٦) . گۆرکی به روسی مانای تاله .
٣ - له م باسه دا مامۆستا فه ریدون عه لی ئه مین ده براره ی پیرمیترد نیشانی دروست پیتکا وه (بروانه : فه ریدون عه لی ئه مین ، چه ند سه رنجیک له پیرمیتردی نهر ، به غدا ، ١٩٧١) .
٤ - بۆ دیار کردنی ئه م ژمارانه که لک له به ره مه کانی موکریانی خۆی و چه ند سه رچاوه یه ک وه مرگرا وه ، تابه ت له : نهرمان ، کتیبخانه ی کوردی ، کهرکوک ، ١٩٦٠ ، نهرمان ، بیللیۆگرافیای کتیبی کوردی ، له چاپکرا وه کانی « کۆری ژانیاری کورد » ، به غدا ، ١٩٧٧ .
٥ - بێ ژماره ی لاپه ره ی چاپی دوومی سیان له کتیه کانی که به سه ره به که وه ٢٠٦ لاپه رهن .
٦ - بێ « فونجه ی به هه ارستان » که ٩٤ لاپه ره یه و سالی ١٩٢٥ له سه له ب چاپی کرده وه باسی « مه شه نی کوردان » ی تیدا کرده وه .
٧ - تابه ت له « زاری کرمانجی و » « گهلاویژ » و « دهنگی کتیبی تازه » دا . لێزه ش دیسان زور به ی وه ره کانی بۆ باسی میژوو ی کورد ته رخان کرده وه ، به لآم هه مان کات ، وه ک دواییش باسی ده کسه ن ، و تهاری میژوو ی کتیبی بلا و کرده وه .
٨ - بروانه : C. J. Edmonds, A bibliography of Kurdish periodical and books published in Iraq. - "Journal of the Royal Central Asian Society" London, Vol. XXIV, July 1937.
٩ - بروانه : نهرمان ، بیللیۆگرافیای کتیبی کوردی ، ل ٢١ .
١٠ - ره واننوز ، ١٩٢٩ .
١١ - ٣٧ لاپه ره به !
١٢ - هه رسیکیان له ره واننوز چاپ کراون .
١٣ - ئه مانیش له ره واننوز چاپ کراون .
١٤ - بۆ ئه م به راوردده که لک له ژماره کانی نه و ئه و خه شتانه وه مرگرا وه که له باشکۆکه ی « بیللیۆگرافیای کتیبی کوردی » ی نهرماننا بلا و کرا ونه وه .
١٥ - به وینه بروانه : « ناو ریکی پاشه وه » ، به ندی دووم ، ل : ٤ .
١٦ - بروانه وهاری « په بنداروونی شاره ستانیه تی له ولاتی سه میهان دوو ره وباراننا » ی حسه ن حوزنی له کۆفاری « دهنگی کتیبی تازه » دا ، به غدا ، ژماره پینچ ، به رگی دوو ، ئه فستۆسی ١٩٤٤ ، ل : ٥١ - ٥٥ .
١٧ - نووسه ره پۆژناوایی به کانی نا ما وه په کیش له سه وه به ر ژۆر جار له بریش عیراق « میسۆپوتامیا » یان به کارده هتیا . دوکتۆر زه کی صالحیش که په کیکه له میژوو نووسانی عیراق سالی ١٩٥٧ کتیبیکی خۆی به ناو وه ره به ئینگلیزی بلا و کرده وه (بروانه : Zaki Saleh, Mesopotamia, Iraq 1600—1914, Baghdad, 1957).



پیتساڤای هه ونه ره مند
مه دحه ت عه لی

MADHAT M. ALI
GALLERI SASSI
vernissage
lördagen den 16 januari kl 13—16
16 jan — 7 febr 1988
GALLERI SASSI - Österlånggatan 29 - 111 31 Stockholm

باسی میژوو تهرخان کراونو ههرستیکیشیان بهرهمی خامی رهنگینی
 حسین حوزنین . له سالی ۱۹۳۰ یشهوه تا سالی ۱۹۴۵ ههموی
 بهسرهکهوه ۱۸۴ کتیب به زوبانی کوردی چاپکراوه که تنها سیازدهیان
 بزوباسی میژوو تهرخان کراون ، بهلام لهو سیازدهبه ههشتیان ، واته پتر له
 نیوهیان ، حسین حوزنی دایانوان .

حسین حوزنی موکریانی ژمارههک وشه و زارای میژووی پهتیی
 دارشتوه یا بهر له پرووناکییرانی تر بق مه بهستی میژووی له نووسیندا
 بهکاری هیتانوانو له زوربهیاندا نیشانی دروست یشکاوه . پتیم وایه بهکم کهسه
 له کاتیکی زووی وهک بیسته کانهوه (میژوو) ی له برتی (تاریخ)
 بهکارهیتانوانوه (۱۶) له سارستی (له میژوه) ی وهرگرتوه که مانای
 رابوردوویکی دور دهگهینو بهوجیره بق وانای (تاریخ) پربهیستی
 خنیهتی . هیچ کام له میژوونووسانی بیسته کان نهو زاراوهمان بهکارهیتانوه .
 زارای (میژوونووس) یش بهرهمی نهو بقچونه وردهی موکریانی به .
 « ولانی مهیان دوو پروباران » که دیسان ماموستا حوزنی بهکم کورده له
 نووسیندا بهکاری هیتانواوه (۱۶) وهرگیرانی دروستی (میسوپوتامیا
 Mesopotamia) به که له دوو وشه یژانایی کون یشکانهوه : « میسوس »
 (Mesos) که مانای (تیوان ، ناوهند ، ناوهراست) و « پوتاموس » (Potamos)
 که مانای پروبار دهگهینو بهسرهکهوه به عراق دهگوترا (۱۷) .

که نهاندازیاری ئینگلیز هاملتن چوه رهواندروزو به چای خۆی ههول
 تهقلای پر له دلسوزی حسین حوزنی بییو زانی « زاری کرمانجی »
 بهرهمی چه نهیجیکه ، له کتیبهکه ی خۆیدا که به ناوی « ریکههک بهناسو
 کوردستاندا » بلای کوردهوه هم راستی به پیمانایه ی تومارکرد ، موکریانی
 « خۆی به تنها وتاره کانی گۆقاره که ده نووسی ، خۆی به تنها وینه کانی
 ده کیشیان ، خۆی به تنها له جایی ده دان و ئینجا دهشی بیجانوه . نهه بق خۆی
 نمونه بهکی بن هاوتایه له سر رووی ههمو زمین » (۱۸) . بهلام هاملتن دهوور
 بشلی موکریانی ، مالی ناوا ، به ههمان دهستور خۆی به تنها دانوو تیکارو
 چاپکری بهرهمی میژووی به کانی بوو ، نهوهی دیسان تائیه له وینهی
 نهبووه ، دیاره زۆر زممه ته له وینهشی بین ا .

وتیرای ههمو نهوانه ی باسمان کردن حسین حوزنی له مهیدانی
 وهرگیرانی بهرهمی میژووی شیدا دهستی بالا بوو . له « گلاویژ » و « دهنگی
 گیتی تازه » دا ژمارههک وتاری بلای کوردهوه که زوربهیانی له عه ره بهیوه
 وهرگیرانه ته سر زوبانی کوردی . ته فانته لهو مهیدانه شیدا حسین حوزنی
 دهیرانی چی بق خویندهواری کورد هه لده بزویی . « نه رمن وه ته نی قهومی یان
 چۆن پهیدا کرد » و (۱۹) « جمال الدین نهفانی » (۲۰) لهو وتاره به که لکانان که
 موکریانی کردوونی به کوردی .

چهند هقههک له مهوادی قوولییی ماموستا حسین حوزنی یان وهک
 میژوونووس که مده کردهوه . ههرچنده خویندهواریکی باش بوو ، بهلام
 خویندنی هیچ کات نهچۆته نهویدی دیواری مزگه وه کانی کوردستانوه ،
 دهووربهی نهوشاش وهک دهووربهی نیسته نهبوو تا بتوانی زۆری لیوه فیر
 بین . ژمارههک زمانی پۆژه لاتی چاک ده زانی (۲۱) ، بهلام له زمانه
 پۆژ ناوایی بهکان تنها که مینک له ئینگلیزی تده گه بیست . بین گومان به کجار
 دلسۆز بوو ، بهلام زۆر جار مه بهستی نهو دلسۆزی بهی په رده بهکی نهستوری
 بهسر بقچونه کانبدا ده کیشا ، نهوهی له پلهی زانستی بهرهمه کانی
 که مده کردهوه . جا ناخۆ ههر دلسۆزیکی تر وهک نهوو له پۆژگاری نهوو له
 جیکه ی نهودا بویه دهیتوانی ناودامان بهرگی « حوزنی » نه پۆشن ؟

بهر چند ژماره بهکی مانادار (۲) . تا کۆچی دواپی سهیدای هتیرای
 موکریان هه قهده کتیبی هه به جۆری بلای کردهوه که یازدهیانی بق باسی
 میژووی کوردو دوانیشیانی بق باسی میژوو به گشتی تهرخان کردووه ،
 واته پتر له دوو سیتی کتیبه چاپکراوه کانی میژوویین . ژماره ی لاپه ره ی
 گشت کتیبه چاپکراوه کانی موکریانی (۲) بهسر به کهوه ۱۶۸۱ لاپه رهن که
 ۱۲۹۵ یان (۲) بق باسی میژووی کوردو ۱۴۷ یان بق باسی میژوو به گشتی
 تهرخان کراون ، واته موکریانی بهسره کهوه ۱۴۴۲ لاپه ره ی کتیبه
 چاپکراوه کانی بق باسی میژووی تهرخان کردووه که له سن چواری
 ژماره ی لاپه ره ی ههمو کتیبه چاپکراوه کانی تیهر ده کات .

خۆ نه گهر یتو ژماره ی لاپه ره ی نهو بهرهمه میژووی به زۆرانه ی
 حسین حوزنی له پۆژنامه و گۆقاره کانبدا بلای کردهوه (۲) بیانخهینه
 سر نهو ژمارانه ی باسمان کردن هه لبته نهوساکه جیکه ی له مهیدانی
 میژوونووسی کوردیدا دیارتر دهین ، ههرچنده بین نهوش به کجار دیارو
 بهرچاوه . که واین هیچ سر نهی نهه مژدنس لهو بیلیژگرافیا پهیدا که
 دهووربهی په نجا سال لهه وه بهر بق باسی چاپه مه نی کوردی عیرانی
 تهرخان کردووه (۲۸) کاتیک دینه سر باسی بهرهمه میژووی به کانو تنها
 سیازده ناو دیتن ده لئ زوربهیان حسین حوزنی دایانوان .

وتیرای نهو ژمارانه ی باسمان کردن و پتیرستیان به هیچ نهنگوستیک
 نهیبه ، که لیک راستی تر له نارادان که مانگی موکریانی له ئاسمانی
 میژوونووسی کوردیدا هتنده ی تر گهش دیار ده کن . حسین حوزنی
 بهکم کهسه به کوردی له زانستی میژوو دواوه . سالی ۱۹۲۵ له « غونچه ی
 بههارستان » دا باسی میژوو ، قوناشه کانی میژوو ، زوبانو په گه زو
 « قهومیته و میلهت » ی کردهوه (۲۹) . دواپی مهلا مه محمودی بایه زیدی
 دیسان حسین حوزنی بهکم کهسه له سردهمی نویدا بهرهمی میژووی
 به کوردی داناوه ، بهلام نهه منده هه به نهویان بق جابای پۆژه لاتناسی
 نووسی نه میشیان بق گهلی کوردی بلای کردهوه ا ، راسته پۆژگاری نهو
 دواته جیاواز بوو ، بهلام ههر بهوده ستوروش نه نهجامی کاره کانی
 تاراده بهکی زۆر جیاواز بوو . بهرگی به کهمی « ناویریکی پاشه وه » (۳۰)
 بهکم کتیبی میژووی بلای کراوه ی سر به خۆی کوردی به کهسه بق باسی
 میژووی کورد تهرخان کراوه ، ههر له بهر نهوشه نهو کتیبه چهند به بارست
 پچوک بین (۳۱) هتیند به مانا گه وره به .

جاری وا هه به ماموستا حسین حوزنی موکریانی له سالی کیدا پتر له
 بهرهمه بیکی دهووربهی میژووی کورد بلای کردهوه . سالی ۱۹۳۱ بهرگی
 سیهمی « ناویریکی پاشه وه » و « میژووی ناودارانی کورد » و « تاریخی
 حوکمدارانی بابان » ی چاپ کرد (۳۲) که بهسر به کهوه نزیکه ی ۴۵۰ لاپه ره
 دهین . پاش سن سال ، واته سالی ۱۹۳۴ « کوردو نادرشا » و « کوردی
 زهند » ی بلای کردهوه (۳۳) که به ههر دوو کیان ۱۸۰ لاپه رهن . شایانی باسه
 بهشتیک له بهرهمه میژووی به کانی حسین حوزنی دوو جار چاپ کراون ،
 وهک « میژووی میرانی سقران » که بهکم جار له رهواندوز سالی ۱۹۳۵ و
 دووه جار له هه ولیر سالی ۱۹۶۲ چاپ کراوه .

بۆ نهوهی باشتر له مانای هم راستی یانه تی بگهین لیره دا دیسان په نا
 ده بهینه وه بهر چند ژماره بهک (۱۴) . له سالی ۱۷۸۸ و تاوه کو سالی ۱۹۲۴
 ههموی بهسره کهوه ۲۵ کتیب به زوبانی کوردی چاپ کراوه که هیچ
 کامیکیان نه زۆرو نه کم و نه به گشتی ، ج جای تاییه تی توخنی میژوو
 نه که وتوون . له سالی ۱۹۲۵ یشه وه تاوه کو سالی ۱۹۲۹ ههموی
 بهسره کهوه ۲۳ کتیب به زوبانی کوردی چاپ کراوه که تنها سیانیان بق

ماموستا حوسین حوزنی موکریانی

دوکتور که مال مزهر نه‌مرد

من نامووی له مخومه وه خهملن بدهم و بلیم ماموستا حوزنی و گه‌لیکی تری وه که نهو به هیچ جۆر نه‌کهوتونه هه‌له‌وه و قه‌ت پیران نه‌خلیسکاره ، به‌لام نه‌وه بۆخۆی پیوستی به لیکدانه‌وه‌ی قوول و تایه‌تری به پیرانی له قه‌اره‌ی کاتو شوینی و پیر له‌یادکردنی دلسۆزی پیران بۆ گه‌ل ، نه‌وه دلسۆزی‌یه‌ی هه‌رگیز هیزی پیرانه‌ری سه‌ره‌کی بووه بۆ گه‌ست په‌فتاریکیان به‌ینی تیگه‌یشتن و بۆچوونی خۆیان ، نه‌گینا به‌ لاداییکی که‌م زوربه‌یان له‌ وێاندا گه‌لن له‌وه‌ی هه‌یانوو زیاتریان ده‌سته‌ده‌گه‌وت (۱) .

زولم و زۆری عوسمانی و قاجاری کاریکی نه‌وتوی کردبوو زوربه‌ی پیران که‌یبه‌ هه‌ره‌ دلسۆزه‌کانی پۆزه‌لانی ناوه‌راست تا ماوه‌یه‌کیش له‌مه‌وبه‌ر باوه‌ریان به‌ ئینگلیزو ماسۆنیزم به‌هه‌تێ پیران ، هیچ دوور نیه‌ تائیشه‌ش هی نه‌وتو هه‌ر مابن . نه‌وه‌ مه‌ریکایه‌ی ئه‌یروکه‌ بۆته‌ دیوهمه‌ لای زوربه‌ی خه‌لک تا رابوردوو‌یه‌کی نزیکیش نیشتا‌یه‌روه‌رانی پۆزه‌لات به‌ په‌نا‌گه‌یان داده‌تاو به‌ سه‌رو بالی به‌کیکی وه‌ک تیۆدۆر پۆزقوت و ویدرۆ ویلسیاندا هه‌ل‌ده‌دا . هه‌رچۆن پیران که‌س نیه‌ بتوانن به‌ هیچ جۆر گومان له‌ دلسۆزی ماموستا موکریانی و نه‌وانه‌ی وه‌ک نه‌وه‌ پیران ده‌کرده‌وه ، بکات .

پا‌ه‌به‌زی حوسین حوزنی له‌ گۆره‌پانی میژوو‌نووسیدا وا خۆ ده‌نوێنن کۆریش نه‌توانن نه‌یینه‌ . لێره‌دا به‌ر له‌ هه‌موو شت په‌نا ده‌به‌ینه

وا‌یزانم له‌ راستی دوورناکه‌ومه‌وه‌ گه‌ل بلیم حوسین حوزنی موکریانی به‌که‌م میژوو‌نووسی کورده‌ دوابه‌دوای نه‌مین زه‌کی شایانی باسو لیدوان پیر . با له‌ ڕه‌نگه‌ی نیجه‌ نه‌فسانه‌به‌که‌وه‌ بچینه‌ ناو جیهانی پانۆ به‌رینی نه‌وه‌ پیاوه‌ گه‌وره‌به‌وه‌ که‌ به‌ ناسۆره‌یه‌کی زۆروه‌ سه‌ری نایه‌وه‌ و به‌داخه‌وه‌ نازناوی « حوزنی » ی له‌گه‌ل خۆی برده‌ ناو گۆره‌وه‌ . ده‌لێن گوا‌یه‌ کاتیکی ده‌سته‌به‌ک له‌ ئارکیۆلۆجیته‌ پۆژئاوایی به‌کان ها‌توونه‌ سۆراخی شوینه‌واره‌ کۆنه‌کانمان ده‌ستوبرد حوسین حوزنی به‌ میخ و چه‌کوش و گازه‌وه‌ خۆی گه‌یا‌ندۆته‌ نه‌شکه‌وتیک و له‌سه‌ر دیواره‌کانی نووسیتیکی ده‌ستکردی هه‌لکه‌ندوو به‌و نیازه‌ی له‌ پایه‌ی ژاری و قه‌دری شارستانه‌تی کۆنی کورد له‌ به‌رچاوی زانا‌یان به‌رزبکاته‌وه‌ . نه‌مه‌ راست پیر یا درۆ به‌ هه‌ر بارێکیدا بیه‌شکینه‌وه‌ ده‌تکه‌یینه‌ ته‌نها به‌ک نه‌جام . دلسۆزی پیران نه‌ندازه‌ی نه‌وه‌ پیاوه‌ که‌ بیانیان به‌ر له‌ خۆمان هه‌ستیان پیتی کردوو‌وه‌ و به‌رز زرخاندو‌یا‌نه‌ (۱) .

حوسین کۆری سه‌یدعه‌بدولله‌طیف پۆزی ۱۲ ی ته‌یلوولی سا‌لی ۱۸۹۳ له‌ مه‌هاباد له‌دایک‌بووه‌ . تا‌لو و ترشیی ژبان و ئاواره‌په‌ی وایان‌لێ کرد « حوزنی » بکاته‌ نازناوی خۆی (۲) ، له‌به‌ر نه‌وه‌ش که‌ مه‌هاباد سه‌ر به‌ موکریانه‌ ، بووه‌ حوسین حوزنی موکریانی .


به‌رهمه‌ چاپ‌کراوه‌کانی

- پێشه‌وا‌ی ئایین . په‌واندز ۱۹۲۶ .
- وێنه‌گه‌ری و کۆلیسن . په‌واندز . ۱۹۳۴ .
- میژوو‌ی کورد و نادرشاه له‌ خاکی ئه‌یراندا . په‌واندز ۱۹۳۴ .
- میژوو‌ی شاه‌نشا‌هانی کوردی زه‌ند له‌ خاکی ئه‌یراندا . په‌واندز ۱۹۳۴ .
- میژوو‌ی ناردارانی کورد . په‌واندز ۱۹۳۱ .
- تاریخی حوکمه‌دارانی بابان . په‌واندز ۱۹۳۱ .
- کورد و نادرشاه . په‌واندز ۱۹۳۴ .
- کوردی زه‌ند . په‌واندز ۱۹۳۴ .
- میژوو‌ی میرانی سۆران . په‌واندز ۱۹۳۵ .
- گه‌لێن ده‌سنووسی هه‌یه‌ هه‌یشتا له‌ چاپ نه‌دراون .

- غونچه‌ی به‌هارستان خه‌له‌ب ۱۹۲۵ .
- خۆشی و ترشی . په‌واندز ۱۹۲۹ .
- به‌خێو‌کردنی کرمی ئاو‌ریش‌م . په‌واندز ۱۹۲۹ (کورین) .
- زۆریکی پاشه‌سه‌وه . په‌واندز . ۱۹۲۹ به‌رگ ۱ .
- زۆریکی پاشه‌سه‌وه . په‌واندز . ۱۹۳۰ به‌رگ ۲ .
- زۆریکی پاشه‌سه‌وه . په‌واندز . ۱۹۳۱ به‌رگ ۳ .
- کوردستانی موکریان یا نه‌ترۆ . پانین . په‌واندز ۱۹۳۸ .
- به‌کۆرینی هه‌لسکه‌وتی دێریکی . به‌غدا ۱۹۴۷ .
- لاپه‌ره‌یه‌ک له‌ دیریکی کوردستانی موکریان . به‌غدا ۱۹۴۷ .

چل سال به سهر كوچى دوايى ميژوو نووسى گهوره ماموستا حوسين حوزنى موكريانى

بروسك



دكتور كمال مزهر بلاو دهكينهوه، كه له باره ي ماموستا حوزنى يهوه، له كتيبى "ميژوو" دا، هاآتوهه . ههروههاليسته ي ناوى كتيبته چاپكراوهكانى حوزنى موكريانى دهخمينه پيش چاوى خويتهرانى " بهربانگه" .

چل سال له مهو بهر، له ئهملوولى ١٩٤٧، ميژوو نووسى و روژنامه نووسى كورد ماموستا حوسين حوزنى موكريانى، دوايى ژبانيكى پر له چالاكى وشه و نوخونى و ماندوو يوونى له پيشاو زبندوو كردنهوه ي ميژوو و زمان و شههبياتى كوردى، چاوى ليك ناو مال ئاوابى له گهلى كورد كرد، ئاوانى رزگارى كوردستان و بهخته وهرى گهلى كوردى برده ژير گل .

حوسين حوزنى له ١٨٩٣/٩/١٢ له سابلاخ (مهباد) لسه دايك بووه . له تهمهنى ١٢ ساليهوه عهدالى خويندن و زانين دهبي مهباد به چي ديلى و له ريگاي مهراغه وه روويكردوته بهيريقان، پاشان توركيا و گهشهكه ي دريژه پي دهدا تا دهكاتنه بهرلين . له سالى ١٩١٥ دوا بهدواي فيرى زنگوگراف و نهخش دهبي، چاپخانهكه دهكرت و ديت له شارى حهلب دايدمه زريني . له حهلب دا، دهكه ويته چاپ كردنى كتيب و دهركردنى گوڤار و روژنامه داگير كه ره فرانسايه كان هه ره شهو گوشه ي لي دهكهن و ناچارى دهكهن حهلب به چي بهيلى . له سالى ١٩٢٥ رووده كاته كوردستاني خوارو و له شارى رواندز ده گيرسيته وه و چاپخانه ي زارى كرمانجى دا ده مزريني، دهكه ويته بلاو كردنهوه ي گوڤارى " زارى كرمانجى" له ماوه ي شش سالدا ٢٢ ژماره ي لي دهركرد . خو ي نووسر و تيب ريگخهرو ويته كيش و نهقاش ،،،، پاشان رووده كاته شارى هه ولير و ناوى چاپخانه كه ي دهگورى و ناوى كورد - ستانى لي دهني . له هه ولير پيش دا گوڤارى " روناكى" دهركه كا . له سالى ١٩٢٦ دواي وه ستانى " روناكى"، شش مانگه ده چي ته سليامانى و بارمته ي پيرمه يردى شاعير دهكا له روژنامه ي " ژيان" دا، له سالانى ١٩٤٣ - ١٩٤٧ به هاوكارى له گهل توفيق وهه ي بهگ به شدارى دهكا له دهركرنى گوڤارى " دهنگى گيتى تازه"، له و سالانهدا دهها و تارى ميژووبى و چيروك له گوڤاره كورديهكانى عيراق دابلاوده كاته وه به تايبه تى له " گه لاويژ و دهنگى گيتى" دا ماموستا حوسين حوزنى له سهره تاي زيانى زانستى دا خه ريكي ليكولبينه وه كو كردنه وه كه ره سه و سه رچاوه ميژوويه كان دهبي له باره ي كوردو كوردستانه وه . تا كوچى دوايى دهها كتيب چاپ و بلاوده كاته وه . ماموستا حوزنى نهك تمنيا شهسپى خو ي له ئاقارى ميژوو و روژنامه نووسى، بهلكوله چيروك و هونه ريشدا تاو داوه . نووسينه ميژوويه كانى حوسين حوزنى سه رنجى ميژوونووس و روژه لاتناسانى كوردو بيگانه ي راكيشاوه وهك : نيكي تين و قليچي - فسكى و مينورسكى و شهدموتدس، ههروهه ميژوونووسانى كورد ماموستا محمه د شهمين زهكى و دوكتور كمال مزهر . بهبونه ي چل ساله ي كوچى دوايى حوزنى موكريانى، شهو و تاره ي

یادی ٤٢ ساله‌ی کۆماری دیموکراتی کوردستان

٤٢ سال لهماو پيش بزووتنه‌وه‌ی رزگاری‌خواری گه‌لی کوردمان سهرکه‌وتنیکی گه‌وره‌ی ودهست هینا، به دام‌مزراندنی کۆماری دیموکراتی کوردستان • بو‌یه‌که‌م جار له میژووی نویمان ئالای رنگاو رنگی کوردستان له مه‌هاباد ئازادکراو هه‌لکرا • ئه‌و ده‌ستکه‌وته، به‌ری خه‌باتی بی وچانی سهدان سالی گه‌لی چه‌ساوه‌ی ک—ورده، دژی داگیرکهران • بیگومان بزووتنه‌وه‌ی کوردی سالانی ١٩٤٥—١٩٤٦ — کوردستانی روژه‌لات، جیاوازیه‌کی چۆنیه‌تی هه‌بوو له گه‌ل بزووتنه‌وه‌و راپه‌رینه— کانی پيشوو دا، چونکه له ژیر ریه‌رایه‌تی پارتیکی دیموکرات ورپياز و هه‌لوپست دیار وپيشکه‌وتن‌خواز داو به‌سهروکایه‌تی روله‌ی لی هاتوو و مه‌زنی کوردستان قازی محهمه‌دی نهمر بووه •

کۆماری دیموکراتی کوردستان، هیاو و ئاوات و خه‌ونی نیشتمانپه‌رو شورشگیرانی کوردی هینایه‌ دی، بووه قیبله و بنکه‌ی ئازادی به‌خش بو هه‌موو پارچه‌کانسی تر • به‌لام ریزیمی به‌هله‌وی و ئاڤاگانی (ئه‌مریکا و ئینگلیز) و ده‌ربه‌گ و کۆتیه‌پرستی نیو— خو، چاویان به‌رایبی نه‌دا، ئه‌و کۆماره ساوايه په‌ره‌به‌ستینی وگه‌شه بکا •

به‌لکو بازووی قین و توره‌بیان لی هه‌لمالی بو له نیو بردنی •

بیگومان هۆی روخانی کۆماری دیموکراتی ده‌که‌ریته‌وه سهرباری دواکه‌وتووی کۆمه‌لگای کورده‌واری و که‌م ته‌زموونی ریه‌رانی کۆمارو هه‌ندۆ هۆی تری نیوه خو و ده‌رکی کاریکه‌ر •

هه‌ر چه‌نده کۆرپه ساوايه ١١ مانگی یه له خه‌ودا سه‌ر برا، به‌لام ژيله مۆی ئه‌و تیکۆشانه نه کوزایه‌وه، به‌لکو تا ئیستاش ئیله‌ام ده‌ری ریکای خه‌باتگیرانی بزووتنه‌وه‌ی رزگاری خواری کورده، و خۆینی پيشه‌وا و هه‌موو شه‌هیدانی ری ئازادی نه‌وتی چرای سهرکه‌وتنی دوا روژمانه •

“بیراتی”

به‌ریانگ

ئۆزگانی لیدراسیۆنی کۆمه‌له کوردستانیه‌که‌ له سوید

ناره‌وی ساڵانه ١٠٠ کۆلی سویدی به‌ ده‌زگاگان ٢٠٠ کۆلی سویدی

به‌ریانگ، ک. ئینگل سهره‌وه‌سه‌ر، ر. ئیادان
ئهمه‌دی ئۆرسمه‌ران، م. به‌کر، ج. کۆزلی، ر. سه‌م، ج. هه‌بده‌ری

Berbang

ئۆرپهان

ئهمه‌دی ئۆرسمه‌ران به‌ریانگ ئیه له ئۆرسمه‌ن و به‌تاره‌کانی لیدراسیۆن
ئای ئۆرسمه‌نای به‌ریانگ ئیه به‌ریانگ ئیه به‌ریانگ ئیه به‌ریانگ ئیه به‌ریانگ ئیه

Box. 45205, 104 30 Stockholm

643880-8

08-68 60 60

UTGIVAR KORSBAND

BERBANG

BOX 45205, 104 30 Stockholm



Författares Bokmaskin
Stockholm 1987